

*Özal ji
mebûsên
HEP'ê re
çi got?*

Rûpel 5



Dewlet û kontra li alîkî Xelk û gerîla li aliyê din



Keça delal evîna min/ Çavhêşin û şêrîna min/ Çi bi hêvî ne ew çavêن te/ Kûr disojojn birîna min

Li Kurdistanê hefteyeke germ derbas bû. TC weke her car bi metodên xwe yên hovane êrîsi Kurdan kir, gund û çiya bombebaran kir û mirovên demokrat û welatparêz kirin hedefa hizb-î kontra.

Li dijî hemû politîkayên imhakirinê hêza gel û êrîşen gerîla xurt dibin. Ref ji hev kifş dîbin. Gel û gerîla dîbin yek kulm û ji dijminê xuwmij heyfa sedsalan hiltînin.

Rûpel 8-9

- ✓ Rûpel 4: Ji bo Özgür Gündemê
Yaşar Kaya
- ✓ Rûpel 7: Dewlet û mirov
Musa Anter
- ✓ Rûpel 10: Çima sewiya ronakbîrêñ Kurd wiha nizm e?
Amed Tigris
- ✓ Rûpel 6: Mêrxasiya medenî
Bavê Nazê
- ✓ Rûpel 13: Bi kurê alîkarî Şêx Seîd Cemîlê Seyda re hevpeyvîn
- ✓ Rûpel 4: Gelê Iraqê di şanoya Sedam û Bush de dinale!
Gavan Koçer
- ✓ Rûpel 5: Fatoş Güney Tempo tekzîb kir
- ✓ Rûpel 11: Mureceeta Weqfa Çanda
Kurdî qebûl nebû!
- ✓ Rûpel 9: Av a Kurdan govend a
dagirkiran



Dengbêjîn
hêla
Serhedê

Rûpel 11



Ordîxanê
Kaşaxî

Rûpel 13



Girarfiroşen
Kurd

Rûpel 6

Ev çawa Kurdîtî ye?

Norwec, Welat- Di vê dawiyê de serokatyên başûrî (Iraqê) ji ber ku bikaribin li Ewrûpayê doza Kurdên bakuri qels bikin, dest bi çalakiyên diplomasiyê kirin. Ji bo vê yekê serokwezirê meclisa başûrê Kurdistanê bi heyetekê ve hatibû serdaniya Norwecê. Ev heyet ji aliye çend nûnerên meclisa Norwecê ve ji hatibû qebûlî kirin.

Ji vê heyetê sê nûner besdarê civînekê ku li Üniversiteya Oslo'ye ji bo leckirina pirsgirêka Kurdan hatibû lidarxistin, bûbûn. Gelek akademisyenê Norwecê ji besdarê vê civînê bûbûn. Di civînê de ev sê nûner doza Kurdan avêtin hêlekê û bi girani li ser tewandarkirina PKK'ê sekînî. Heta ji wan hat PKK'ê wek

rêxistîneke antîdemokratik nîşan dan. Li ser vê yekê çend kesen Norwecî heyret man û ji wan pirsîn: "Gelo ev rexneyên we yekbûnî û hevalbendiya Kurdan qels nakin? Alîkariya Amerîkayê ne xas e. Ew dixwaze rî li serhil-danên Kurdan bigire û nêzîkbûna wan herdem qels bike." Ev pirs bê bersiv man.

Li ser pîrsa ku, "Gelo çîma we li bajare Silêmaniyê du mirovên PKK'ê, ku besdarê meşê bûbûn, kuştî? "Jî mecbûr man û di ber-sivandina xwe de mirovên PKK'ê, wek kesen biyanî, ku ji derve hatibûn û provakatorî diki-rin, dan diyarkirin. Herwiha hebûna PAK'ê ji înkarkirin û ew wek çend provakatorên PKK'ê, ku dixwazin rewşa Kurden başûrî

xera bikin, pêşkêsi civînê kirin. Lî dema ji temaşevanan reaksiyon hat ku medyaya Rojavayê behsa PAK'ê kiriye û ew wek partiyeke tê naskirin, wê çaxê mecbûr man, gotin:

"Erê, bi medyaya Rojavayê ve pîrsigirêken me hene û em pîr caran bi wan re dikevin dubendian."

Serokê meclisa wan ji di rad-yoya dewleta Norwecê dê PKK'ê weke rêxistîneke pîrr bi talûke û antîdemokratik dabû nîşandan.

Xeberdana vê heyetê ya li dijî PKK'ê gelek Tirkê Norwecê şâkirin û Tirkân digotin, "Edî ne hewce ye ku dewleta Tirkîyê ji bo qelskirina PKK'ê xwe bişînê. Ev karê han Kurden Iraqê baştir bi cih tînin."

Radyoya Dengê Dîcleyê dengê kê ye?

Navenda Nûçeyan- Mebûsên Partiya Keda Gel (HEP) ên Di-yarbekirê Leyla Zana û Sedat Yurtdaş, der barê radyoya "Dengê Dîcle" de li meclîse ci-vîneke çapemeniyê çêkirin. Leyla Zana û Sedat Yurtdaş li ser vê radyoya qorsan wiha gotin: Me tu bersiv, ji pîrsa xwe ya der barê vê radyoyê de negirt? Ew radyo weşana xwe, ji pêla navîn li ser 1584 khz'ê didomîne. Serokwezirê Tirkîyê Süleyman Demîrel, di hemû bayanîn xwe de digot: "Em li hember weşanîn bi Kurdi ne." Lê ev weşan, li derveyî zanîna

serokwezir, hikûmetê, êndamên hikûmetê, çapemeniyê û raya giştî, çawa dikare bidome? Em bi kurtî ji serokwezir dipirsin; "Kî Tirkîyê idarê dike?" Radyoya Dengê Dîcle, bi teknîkeke pêşveçûyi, lê bi Kurdiyeke xerab û müzikeke basit, propagandaya siyaseta dewleta Tirk a 70 salan dike. Lî dema vê propagandayê dike, prensiba laîkiyê li aliyeke dihêle û Tirkîyê wek welateki "Muhemedi" bi nav dike. Li gor hin çavkaniyê ewlekar, ev radyo weşanîn xwe li Tugaya Mekanîze ya ku li nêzî Devege-çidiyê ye didomîne."



Leyla Zana

Neyartiya gelê Kurd û 'Hîzbullah'

Î. Xort

Dewletê dagirker li hemberi têkoşîna rizgariya gelê Kurdistanê gelek taqtik ceribandin. Gerîna'a-warte, ordiya taybeti, cerdevan (korucu), kontrgerîla... Taqtika dawî ji "Hîzbullah"e.

Ci ye Hîzbullah? "Partiya Xwedê" heti niha ci kiriye û ci dike? Her tiş ronî dibe. Edî herkes dizane ku "Hîzbullah" rêxistîneke Daîreya Şerî Taybeti ye (ÖH), Özel Harp Dairesi). Kontrgerîla zû teşîr bû, ji bo vê yekê ji nav guherî: Hîzb-î Kontra.

Cîma Hîzbullah (Hîzb-î Kontra)?

Dewlet dizane ku gelê Kurd bi pirranî musulmanê sunî ye. Tişten ku nikaribû bi navgînên (araç) din bikira, ol (din) ji xwe re kir navgîn. Ji bo ku bigîheje vê armanca xwe ji, Kurmancê belengaz i ol-perest (dindar) bi pereyan ji xwe re kir leyistik û ji wan re gote Hîzbullah.

Qasi ku gelê Kurd li musulmantıya xwe xwedî derdikeve, tu gel li musulmantıya xwe xwedî dernakeve, Erebênu ku musulmantı ji nava wan derket ji

tew! İro fen û fût, fuhûş, faîz û ci-qas tiştekî nebaş hebe di nav gelên ku dibejin em müsulman in de heye. Ma di nava Kurdan de ji tune ye? Heye lê ne bi qasî milletên din. A din divê mirov li dema ku Hîzbullah derketiye binêre!

Kengê têkoşîna rizgariya nete-weyî bi çekdarî hate holê, neyar ji serkevtina xwe kete şikê (şûpe), neyar derziya harbûnê (kuduz) li ev belengazên olperest xist û ajot ser welatparêzan. Têkoşîn li kijan deverê xurt bûye, Hîzbullah li wê derê li hemberi têkoşîna rizgariyê amade ye! Welatparêzek li kijan deverê hebe, Hîzbullah dixwaze wî li ser navê olê tune bike. Meleyek, Şêxek, Sofiyek ku xwe nefiro-tibe û li welatê xwe xwedî derdikeve, ew ji, di devê tisîngî Hîzbullah de ye. Û temamî van tiştan ji, li ser navê musulmantıyê dikan. Em karin vêna bi dilekî fireb bibêjin, ger Hîzbullah musulman be, gelê Kurd ne musulman e, ger gelê Kurd musulman be Hîzbullah ne musulman e.

Mirov kare van pîrsan ji bike: Musulmantı alikarê mazluman e yan zaliman e? Ma dewletê da-

girker ji Kurdan musulmantir in? Ma tişten ku van dewletan bi serê Kurdan ve anîne kesî nehaniye serî kesî? Ev rastî ji li aliyeke. Emê bibêjin gelê Kurd ji riya Xwedê derketiye. Ma dewleta Tirk, Ereb û Ecem ji müsulman e?

Cîma rojekê, hema bi derewan be ji derbekê li wan ji naxe? Fehş û fuhştiya ku li metropolên Tirkî hene li kijan deverê heye? Ji Behra Spî bigir ta Behra Reş, qiraxên behrên Tirkî ne hêlinâ fuhşê ne? Banqeyên Tirkî gişt faîzê nakin. Kijan dewlemendê Tirkî zekata xwe dide? Kijan ji wan nimêta xwe dike û kijan ji wan xwe û dewleta xwe û gelê pêşkêsi împarîzîmê nekiyî? Û kijan Hîzbullah kare bi dilekî safi bersiva van pîrsan bide? Bersiva van pîrsan ji, weke Hîzbullah tarî ye, (bi rastî ne tarî ye, lê bila tarî be!) bê gu-man wê rojekê ronî bibe.

Çawa ku têkoşîna rizgari te-mamên van êrişan bertaraf kir, wê êrişen van rih bi qirêjan ji berteref bike û hew tenê, wê weke wan êrişanen din tevî rûpelê qirêjîn dîrokê bibe û pêşengî wê bi gelê xwe re ber bi rojîn azad ve bime-şe.

HAWAR

Dilbixwîn

Roja xatirxwestinê

Belkî em careke din hev nebîn, belkî em bi hezaran kilometran ji hev bi dûr kevin, belkî bi dehan sal derbas bibin û çavên me li hev nekevin. Çendî ku ev gotin tal bin ji, lê rastî ye, ez naxwazim ber dilê te xweş bikim û çirokan ji te re bibêjim, ez naxwazim bi te bikenim. Na, rastî ev e. Ev xatirê ku ez ji te diwxazim, xatirxwestina dawiyê ye, ev dîtina dawiyê ye, têra dilê xwe li min binêre, ji bo ku tu min di xewn û xeyalên xwe de nebîn, binêre.... Li çavên min, li dev û lêvên min, li enî, poz û dêmên min, ji ser, heyâ pê bila çavên te ji bejn û bala min werin dagirtin. Edî ezê xatirê xwe ji te bixwazim.

Dizanim niha kezeba te di nava êgir de ye. Qirika te tiji girî bûye, bêhna te teng bûye, çavên te weke çaviyên qinaya xemilandî, ji hêstiran hatine dagirtin.

Ez digihêjim, tu bist salên derbasbûyi di vê kîliyê de tîni bîra xwe. Tu geleki

Ez dizanim hêstirênu ku ji çavên te têne xwarê ci stranan dibêjin. Ez dizanim, ji bo ci te serê min daye bir dilê xwe û hêdî hêdî dîlorînî. Ez baş dizanim li ber çavên te dinya bûye mij û moran. Ne tu tenê, ez ji bi vê eşâ te re dêsim, lê hema tu caran girî û nalîn nikarin şewata di kezeba te de, bikujin.

Belê, wanî me ji hev hez dikir, wisa em bi ser hev de dikiliyan, wiha tarî li me ronî dibû.

Ez dizanim hêstirênu ku ji çavên te têne xwarê ci stranan dibêjin. Ez dizanim, ji bo ci te serê min daye ber dilê xwe û hêdî hêdî dîlorînî. Ez baş dizanim li ber çavên te dinya bûye mij û moran. Ne tu tenê, ez ji bi vê eşâ te re dêsim, lê hema tu caran girî û nalîn nikarin şewata di kezeba te de, bikujin.

Helal bike li min wan westabûn û zoriyên ku te di ber min de kişandi. Li min helal bike wî şîrê ku te bi mehan dayî min. Negirî, li şûna girî zilxitan bike, li ber dilê bavê min bide, bila birayê min ên biçûk vê şînê nebîn, wana hînî strana azadiyê bike, bila bizanibin sirûda azadiyê bixwînîn. De rabe, dev ji vê çiroka xwe berde. Here bixêrhatina jînên ciranan bike, serî bikişîne, govendê bigerine, destê xwe bide destê min û bihejîne desmala rengîn... Dilê van bilbil û şalûlîn li ser şaxên daran nehêle.

Biborîne, ez mecbûr im êdi xatirê xwe ji te bixwazim. Heval li benda min in. Divê ez dereng nemînim. Hemû daxwazên xwe yeko yeko ji min re rêz bike. Wesiyetnameya xwe ji min re bibêjim.

Eger şehîdbûn, bû qîsmetê min, hiç meraqan neke, wê hevalên min te xeberdar bikin. Eger fersend çebû ezê nameyekî ji te re li pey xwe bihêlim, dema name bi xwîn bû, tu bizanibî ew xwîn xwîna lawê te ye. Bila haya te ji te hebe guh nede xêrnexwazan, destê hevalan biguvişe, herê pêşîya wan û xêrhatina wan bike. Wê nameyê ji te re bixwînîn, hêstirênu di çavên xwe de ji wan veşêre. Nameyê winda neke, ji rojnameyê re bişîne, tu dikarî çend gotinan li ser min bibêjî.

Eger ez şehîd neketim emê li cihekî din hev bibînîn, wê hevdîtina me li Amedê be. Emê bi hev re damezirandina Cumhûriyeta Gelî pîroz bikin. Emê li Serok û li belavoka damezirandinê guhdarî bikin.

Ez ji te re, li ser sedema vê çûyînê deng nakim. Ji van partî martiyan bêhîr di vê malê di civîn çêbûne. Gelek hevalên nirxdar çûne û hatine, te pîrr li wan guhdarî kirîye.

De careke din bi xatirê te. Dibe ku em hev nebîn, lê bizanibî min têra xwe li te nihêri. Li kuderê dibe bila bibe, ezê her demê te bi xweşî û rîndî bînîm ziman.

Bi min re li hemû hevalan silav bike... "

Gelê Iraqê di şanoya nav Sedam û Bush de dinale

Gavan Koçer

Bi navê Neteweyê Yekbûyi (NY) polisên dinyayê yên dewletê Amerika, Ingîlistan û Fransayê, bi balefirên xwe cardin dest bi bombebarana Bexdayê kirin. Di van bombebaranan de gelekî Iraqî hatin kuştin û birîndarkirin. Amerî-


ka hem dikuje, hem borînê distîne. Sedam diçe serdaniya nexwesan. Ev nêzî du salan e hoyen da girkirina dewleta Iraqê didome. Dubendiyê nav herdu aliyan, bi pevçünê gotinan dest pê kir û ket vê radeyê. Li gor Rojava didin diyarkirin, sedemê dubendian dudo ne: a) Lêkolînvan, ên ku bi

navê NY'ê dikevin Iraqê, çawa xwe bigihînin Iraqê û karên xwe bi cih bînin. b) Dubendiyê li ser sînor ku di nav Iraq û Kuveytê de ye. Kuveyt idia dike ku Iraq şertê YN'ê bi cih nayine. Rastî ci ye, ew ne vekirî ye.

Iraq ji aliyê xwe ve destûr daye NY'ê ku ji ser Urdinê ve were. Lê ev ji aliyê Amerika û hevalbendên wê ve nehat qebûkîrin. Serokê Komîsyona NY'ê, Tim Trevan, di got: "Ji ser Urdinê ve gîhîstîna Iraqê, tesîra karê me kêm dike.

Iraq mîsogerîya (garanî) ewle kariya firîna ekîba NY'ê ya li ser paralela 32'yan nagire ser xwe. Vê ji wiha diparêze: Amerika ji me garantiya firîna balefirîn ekîba NY'ê yên ku li ser paralela (hêlipana) 32. an difirin, dixwaze. Lê em ji vê tiştekî fam nakin, ji ber ku ev herêma han ji balefirîn me re gitteye û qada firîn bî tevayî di bin kontrola Amerikayê de ye."

Di rastiyê de, di bin pevçünâ de pirsgirêkîn girîng hene. Iraq, ew qadênbayê (dorênu ku balefir lê difirin) ku li bakur û başûrê welaletê ji aliyê Amerikayê (USA) ve hatine afirandin û ji Iraqê re qedexe ye, naejirine. Pentagon bi xwe ji qebûl dike ku li bakur du bale-



Ji rojnameya The Guardian

firênen wan ji aliyê Iraqê ve hatine gullebarankirin. Ev ji li zora Amerikayê ku digot, "Me Iraq ji hêla leşkeriyê ve tarûmar kiriye," diçe. Gelo çawa weliteki wêrankirî dikare li ber me serî rake?

Piştî kurtebirina vê bûyerê, mirov dikare van pirsan ji xwe bipirse: Gelo ev dubendî û pevçün wê hetâ kengê bidomin? Gelo di rastiya xwe de Rojava dixwaze pîrsan sînorîn nav Kuveytê û Iraqê çareser bike? Gelo li kendavê (xelîcê) armanca Rojavayan ci ye? Cîma Rojava dagirkirina dewleta Tirk a bakur û başûrê Kurdistanê û kîrinê İsrailî, herçend qaîdeyên NY'ê dipelixînin ji, diparêze?

Rojava li diji belavkirina dewleta Iraqê ye. Naxwaze Iraq ji hev belav bibe û bibe sê beş. Belavbûna Iraqê ji bo stabiliteya xwe ya herêmê talûke dibîne. Lê dixwaze Iraqekî neçar û bêhêz bibîne. Ev hem xwestineke İsrailî ye, hem ji, ji bo berjewendiyê Rojavayan ve bi awayekî vekirî hatibû piştandê û bûbû xwedîyê aborî û leşkeriyeye xurt. Ev ji, ji bo İsrailî û di gelemerpiyê de ji, ji bo Rojava bûbû eşâ serî. Tîrsa rojava ne Sedam bû, lê planen wan li gor guhertînên pêşerojê bûn.

Sedam mirovîkî xwindest e. Bi sed hezaran Kurd û Ereb kuştine. Gund û bajar wêrandin e. Lê xwindest ne tenê Sedam e. Li ser gerdûnê xwindesten wek Sedam pîr in. Tîriye û İsrail, ji bo vê du mînakîn pîr baş in. Ne ku em Kurd in, vê dibêjin. Ev rastiyekî vekirî ye. Heta hêşînbûna giyayan ji, wan dişine. Lê mirov ji terora bombeyê USA'yê re ci bîbêjê? Li vir xwestina me ev e: Ji bo rojavayan hebûna Sedam, ji çebûna dewleteki Kurd û dewleteki Şii, ku dikare bikeve destê Iranê, çetir e. Heger Sedam here rewşa pêşerojê nevekirî ye. Kurdîn bakurî dikarin xwe xurttir bikin. Jîxwe Sedam ji mirovîkî bêdenge ye. Ji ber vê yekê ye ku Rojava dijmintiya Sedam wek tiştekî îdeal dibîne.

Heger rast be ji sedi 60-70'î nifta (petrola) dewleta Kuveytê di destê dezgeh û şirketên USA'yê de ne û petrola Rojhîlat, erzan dikeve destê USA'yê ku aboriya wê di krîz de ye. Lewma naxwaze van derfetan ji destê xwe derxe. Ji bo vê ji Kuveytê diparêze. Bi gotineke din parastina Kuveytê parastina wan e. Domandina serdestiya şêxen Kuveytê domandina berjewendiyen USA'yê ye.

USA piştgiriya Kurdîn başûrî (Berzanî û Telabanî) dike. Armanca vê, rîlégirtina yekbûna Kurdan e. Ev serê ku di vê dawiyê de di nav PKK'ê û Tîriye û hêzîn Eniya Kurdistanê de derket encama vê piştgiriye bû. USA û dewletên herêmê ji xurtbûnên hisîn geleri ên Kurdan tîrsiyan.

USA dixwaze bide nîşan ku politikayen Washingtonê bi Clinton nayê guhertin.

Bush bombeyan dîbarîne û Sedam şanoyê dilize, lê yên ku dinâlin gelê Iraqê ye.



SEROKATIYA AMERİKA di 20'ê Çileya 1993 yan de, ji George Bush dîwrî Bill Clinton bû. Lî tevî serokatiyê, bar û pirsgirêkîn; deyndariye mezin ya hundîrin, bêkarî, Şenê Xelîcê û bi tevahî ji 'nzama dinyayê ya nû' kele ser milî Bill Clinton. George Bush ji Bill Clinton re Amerikayekê ji hundir ve xwedî pirsgirêkîn mezin û cîvakeke zekel, ji dîrve ve ji, politikayen aktif û militarisit hîst. Tişte tê meraqkirin ew e ku, wê Bill Clinton Amerika û politikayen wê çawa û çîqas biguherîne?

GOTIN



Yaşar Kaya

Ji bo Özgür Gündemê

Rojnameya Özgür Gündem, xebata xwe ji bo demekê rawestand. Cemiyeta Rojnamegeren Hemdem (Çağdaş Gazeteciler Cemiyeti) xelata xwe yê ışal da Özgür Gündem. BBC ji, çend şev berê cih da beyanên me ku me wiha gotibû: "Me rojnameyê ji ber êrîşen dewletê girt. Gelek hevalên me kuştin. Li Kurdistanê nahêlin ku em rojnameyê belav bikin. Emê bifikirin û ji vî yekî re çareyekî bibînin".

Ev çend roj in ku xwendevanên me yên hêja telefon vedikin. Gelek bi ber rojnameyê dikevin. Dibêjin, "Bila rojname ji nû ve derkeve. Em dikarin mal û canênu xwe bidin." Ji van gotinan ji kîfî e ku Özgür Gündem, di nav gel de cih girtiye. Gelek ji wan ji dibêjin, "We serê me jêkir. Em hînê Gündem bûbûn, niha emê kîjan rojnameyê bixwînîn?"

Dewlet ji çar aliyan ve em dabûn ber gulleyan. Hê di destpêka derketina rojnameyê de, li hember me ilana şer kirin. Ji hevalên Tirk re digotin: "Ev rojname ya Kurdan e, neçin tê de nexebeitin". Ev gotin fêde nekirin. Dû re dest bi qetîşaman kirin. Ji nivîskar û nûçevanên me 6 kes kuştin. Dîsa ji kesî gavek bi paş ve neavêt. Dîtin ku ev ji fêde nekir, dest avêtin belavkirina rojnameyê. Bi kuştin û êrîşen ser bayian ve, xwestin rojnameyê li Kur-

distanê qedexe bikin. Ev şer ji bo me şerî çapemeniyeke bi şeref e. Li ser riya me gelek çiya û banî hene, emê vê ji rast bikin.

Ez dixwazim ji bo Gündemê çend gotinan bibêjim. Gündem kela şehîdan bû. Li ser xwîna şehîdan hatibû avakirin. Xebatkarên Gündemê, bi şev û rojan, keda milî xwe û ronahiya çavênu xwe tev lî rojnameyê dikirin. Hevalên me yên Kurd, di warê rojnamegeriyê de, gîhîstî nîn bûn. Hevalên Tirk ji, rojnameyê ber bi fikra xwe ve dikişandin. Gündem, di van 8 mehîn jiyana xwe de, hem bi dewletê re, hem ji di nav xwe de, şer dikir.

Neyarê Gündemê, bi tenê ne dewlet bû. Kemalîstan ji di nav rezîn neyaran de cihê xwe girtibûn. Ew bêbav, gelek piştgiriya dewletê kirin. Ci hate ber devê wan ji bo Gündemê gotin. Gündemê 8 mehan li ber xwe da, li ser piyên xwe sekînî û bersiva wan ji da.

Lê mirov nikare înkâr bike. Li Ewrûpa û li welêt, Gündem gelek karên bi şeref, xîret û baş çêkirin. Li dinê û li Tîriye, di nav salekê de, ji bo Gündemê gelek tiş hatin gotin. Ev ji rûmîta me gişkan e. Me di nav salekê de, heval û hogîrên xwe şâkirin û di dilî dijimin de ji bû kul û derd. Me sond xwariye, emê Gündemê ji berê xurttir û rîndir derxin. Ew serbilindîya me gişkan e. Emê dilî neyaran şâ nekin. Dê di demeke kin de Gündem ji nû ve derkeve.

Baweriya me ew e ku, em di nav 8

mehan de ji hevalên xebatkar gelek tiş hîn bûn. Di vê dema nû de, emê riyeke nû bidin ber xwe. Çepen Tîrkan, derd û kulên me weke me nizanîn. Wan gelek karên çewt kirin. Bi rî ve çûyîna me kîfî e. Em ji bo azadî û serbestiya gelê xwe dixebitin. Xebat ev e. Di nav vê xebatê de, demokrasî û sosyalîzm heye, biratiya gelan heye.

Edî Kurd, bêyî rojnameyeke rojane nabin. Ev kîfî e. Rojname dengê şoreşê ye, dengê gelê Kurd e. Kurdan, ji dîroka xwe yê 150 salan rojnameyeke wiha derxistine. Em di vê xalê de gîhîstîne rîza gelân din.

Ne hîsan e. Gündem, bi jiyana me gişkan re bûye yek. Ew ne zarokê me bû, ew ji me re bûbû heval. Xewna me rast bûbû.

Ji bo hevalên me yên ciwan ji bûbû mîna zanîngehêkê. Gelê me, mîna werin ziyaretgehê dihatin û diçûn Gündemê. Serê kî bişîya dihat Gündemê.

Em nahêlin neyár şâ bibin!..

Tîrs û xof ketibû dilê wan. Gündemê gelek karên girîng kir. Neyarê Gündemê ji digotin, "em gelek tiştan jê hîn dibin". Ji van neyaran yek jê, danişmendê Süleyman Demirel, İlñur Çevik bû.

Çepen Tîriye, di nav 70 salî de, hê rojnameyekê wiha dişîtin. Gündemê rûpelên xwe ji wan gişkan re vekirbû. Ev ji bû karêkî giranbuha ji bo têkoşînê.

Neyarê Gündemê, bi tenê ne dewlet bû. Kemalîstan ji di nav rezîn neyaran de cihê xwe girtibûn. Ew bêbav, gelek piştgiriya dewletê kirin. Ci hate ber devê wan ji bo Gündemê gotin. Gündemê 8 mehan li ber xwe da, li ser piyên xwe sekînî û bersiva wan ji da.

Berxwedan jiyan e, jiyan xweş e, mîranî û servanî, ji her tişî xweşîr e. Em li vir in, naçin tu cihî. Doza me serfirazî û azadî ye.

Hêza Çakûç û Tirkîye

Bi bombebaranê Amerika yê li ser Iraqê re, li Tirkîye der barê Hêza Çakûç de, guftûgoyen nû dest pê kirin. Weke tê zanîn, ji bili balefirên ku ji ‘İncirlik’ê radibin û Bexdayê bombe dikin, Hêza Çakûç ji, raste rast di nav şer de cihê xwe girt. Li gor agahiyân heta niha 3 balefirên Iraqê, ji alî balefirên Hêza Çakûç ve hatine daxistin. Gelek ji wargehên leşkeri yên Iraqê, bi bombeyên Hêza Çakûç hatine rûxandin.

‘Îskence zêde dibe’

Li gor Rapora Mafen Mirovan (1992) ku ji aliyê Wezareta Karê Derveyî ya Dewletên Yekbûyi yên Amerika ve hate weşandin tê diyarîn ku, li Tirkîye ji bo rakirina îskencyeyê tu reformên idarî nehatine çekirin û îskence herwiha bi zêdahî didome.

Li gorî çavdêrén (gözlemci) bêteref, rojnamevan û komeleyên mafen mirovan dibêjin ku li Tirkîye di “windabûna insanan” de, di cînatetên ‘faîli meçhûl’ de tiliya dewletê heye. Di raporê de tê gotin ku, ev cînatetên ‘faîli meçhûl’ li bakurê Kurdistanê roj bi roj zêde dibin. Rapor diyar dike ku, li Tirkîye îhlal-kirina mafen mirovan, îskence, sûcînî siyasi, windabûna mirovan, pesta (pêkutî) hêzên ewlekariya dewletê, xirâbiyên wan, qedexekirina ciyîn û bi serbestî xebardana insanan, didome. CMUK ji van pirsigirêkan re nebûye çare ji ber ku, CMUK di nava xwe de, ji tevahî û wekheviyê dûr e, bêkêr e.

Sergêjahiya CMUK’ê

Dadgeha Qanûnê Bingehîn mureceeta Dadgeha Ceza ya Sulh a Kirşîrê, ji bo iptalkirina xala 31/1’an Qanûnê Usûl’ yê Muhammekirina Cezayî (CMUK) serî li Dadgeha Qanûnê Bingehîn (Anaya Mahkemesi) dabû. Dadgeh, ji ber ku xala 31/1’an li dijî prensîba wekheviyê ya Dadgeha Qanûnê Bingehîn e vê serlêdanê kiribû. Li gor vê xalê, sûcîn ku bikevin nav sinorêne Dadgehîn Ewlekariya Dewletê (DGM), ji vî qanûnî nikarin feyde bibinîn. Sedema redkirina serlêdanê bi qai-deyê ku eger qanûn bikeve nav sinorêne çespînen dadgehan, dadgeh dikarin ji bo iptalkirina xalê serî li Dadgeha Qanûnê Bingehîn bixin hate girêdan.

Aşîtê 53 can bir

Li gundê Ozengelî yê Baybûrtê 53 cendek ji binê aşîtê hatin derxistin. 21 kes ji bi birîndarî ji aşîtê hatin filitandin û 3 kes ji hin winda ne û tu hay û agah ji wan nîn e. Di 18.1.1993’an de aşîteke mezin, saet li derdora 07.10 an bi ser gund ve hatibû. Pişti bûyerê 9 saet bi şûn ve, alikarî gîhiyabû gund. Di vê bobleta (felaket) hanê de kesen ku dibin aşîtê de mane û mirene, pirraniya wan pîr, kal û zarok in. 75 mal di binê aşît û şepeyê de mane. Tê daxuyan ku 2 hezar pez û dewarêne gund ji di vê bûyerê de telef bûne.

Özal ji mebûsên HEP’ê re ci got?



Özal: “Binîrin di programa Qanal 6 de Yaşar Kaya çawa peyivî, her tişt got, bê sînor nêrînên xwe anîn ziman.”

Navenda Nûçeyan- Mebûsên HEP’ê yênu ku besdarî resepsiyo-na sala nû ya dawîn bûn gili û gazinên xwe ji Serokkomarê Tirkîye Turgut Özal kirin û ji nû ve vegera wî ya siyasetê jê xwestin.

Di resepsiyonâ sala nû ya ku li Koşka Çankayayê di 18.1. 1993’an de çêbû pênc mebûsên HEP’ê Orhan Doğan, Sirri Sakik, Zübeyir Aydar, Selîm Sadak û Remzi Kartal ji besdar bûn. Mebûsên HEP’ê sohbetekî li ser çespînen hikûmeta koalisyonê, çespînen rîveberiya dirêj bi Özal re kirin. Mijara sohbetê taybetî, çetevaniya gundan û nêrîna dewletê ya pirsigirêka Kurdî bû.

Mebûsên HEP’ê ji bo çareserkirina gelî û pirsigirêka Kurdî, ideolojiya fermî (resmî) ya dewletê û sekinandina şerî di navbera PKK’ê û dewletê ji Özal xwestin. Û dan xuyan ku ev gelş û gelemse bi zora leşkeri çareser nabe, tek çare diyalog û aştî ye.

Mebûsê, HEP’ê Sirri Sakik ji Özal re wiha got: “Ji we pê ve kes nikare tabûyan hilweşine, çespînen rîveberiya taybetî û parêzvaniya (çetevaniya) gundan we anî, lê hûn ji li çewtiyên xwe werqilin, edî rexneyên xwe ji wan re tînin. Vegerin siyasetê û van gelş û pirsigirêkan hel bikin.”

Orhan Doğan ji ev gili û gazinên xwe ji Özal kir: “Ku riyan demokratik bêne girtin tiştên ku em bikin ji namîne. Divê ev talûke bê dîtin. Divê rê neyê daxiyin ku şerek di navbera gelê Kurd û Tirk de bê jiyan, bila rê li ber bê girtin ku Tirkîye mina Bosna-Hersekê nebe.”

Mebûsên HEP’ê li ser hêza PKK’ê ji rawestiyan û artesbûna PKK’ê bi bîra Özal xistin ku edî ew bi gotina dewletê ya fermî, ne “çete” û “eşqiya” ne.

Li ser van gazin û daxwaziyên HEP’vanan, Özal ji li ser rewşa raya giştî ya gelê Tirk rawestiya û nêrînên wan ên der barêne guherîne de, da xuyan.

Özal, “Her tişt bi demê re diguhere, deh sal berê dema ku min qanûnekî der barê pereyê Tirk de derxist, her kes rexneyên xwe ji min re anîn û êrisi min kirin. Lî tro herkes heq dide min. Raya giştî bi salan hatiye şekirkirin, di binê tesirê de mane.

Divê her tişt bi lezgîni çenebe, bi demê re hertiş diguhere. Binêrin di programma Bizim Koluk (Kursiyê Me) ya Qanala 6. de Yaşar Kaya çawa peyivî her tişt got, bê sînor û asteng nêrînên xwe anî ziman.”

Özal piştî vegera xwe ya ji Amerika, da xuyan ku dixwaze bi wan re disa hevdîtinekê çebike.

Fatoş Güney Tempo tekzîb kir

Navenda Nûçeyan- Fatoş Güney di 21’ê Çileya 1993 yan de li Stenbolê ji bo çapemeniyê civînek çekir û daxuyaniye belav kir. Güney di daxuyaniya xwe de li ser idayen kovara Tempo û rojnamaya Hürriyet sekinî. Tempo û Hürriyet di hejmara 13’ê Çileya 1993 yan de li

ser navê Serokê PKK’ê Abdullah Öcalan hin idia rîz kirin. Li gor van idianan Fatoş Güney bi serokê Enstituya Kurdi ya Parisê Kendal Nezan re di têkiliyeke taybetî de bûye û Yılmaz Güney ji, ji vê qehrî miriye.

Li gor lêkolîn û agahiyên Kurd-Ha Serokê Giştî yê



Fatoş Güney

PKK’ê A. Öcalan ev idia tekzîb kir û tiştîki wiha negotiye. Li ser daxwaza Kurd-Ha, çavkaniyên PKK’ê, kaseten video û materyalên hevpevîna Yalçın Küçük û Serok Öcalan dan ajansa Kurd-Ha. Kurd-Ha li ser van materyalan xebiti û wan ji hev veqtand. Rastî derket holê ku ev mijûlî ne ji aliyê Öcalan ve hatiye kirin. Ev idia ji aliyê Yalçın Küçük ve hatiye kirin.

Li aliyekî din ji ev rojname û kovar idia dikin ku Fatoş Güney bi perên ku di Weqfa Yılmaz Güney de hatine ci-vandin li Parisê xaniyekî kiriye û tê de dijî.

Li ser van idianan Fatoş Güney di daxuyaniya xwe ya ji bo çapemeniyê de diyar dike ku” Weqfa Piştgiriya Yılmaz Güney di 11, 12, 13 Cotmeha 1991 an de, li sê bajarêne Almanya şevîn piştgiriye li dar xistiye. Û ev perên ku di van şevan de hatine civantin. 40.000 markê

ku ji ber mesrefan mayî bi destê vê dernekê bi xwe teslimî hesabê Weqfa Güney bûye.


“Ji bo avakirina “Weqfa Yılmaz Güney a Çand û Hunnermendî” 300 milyon TL lazim bû. Ev 40.000 mark têra vê nedikir. Perên ku kêm mabûn min bi xebata xwe ya şexsî kar kir û hin ji bi alîkariyan hat temamkirin û di vî hesabî de hat blokekirin. Bi vî awayî ji weqfa me damezirî. Min xaniyê xwe yê li Parisê di Adara 1990 an de piştî wefata bavê xwe bi para xwe ji mîrasa bavê xwe kîrî. Yanî bi 20 meh beriya van şevîn alîkari û piştgiriya weqfî ve.”

Wekî din ji li ser navê Komela Dostêne Yılmaz Güney, Binali Akpinar û Komeleya Weqfa Piştgiriya Yılmaz Güney ji, piştgiriya daxuyaniya Fatoş Güney kirin û xeberên Tempo û Hürriyet bi daxuyaniyên xwe tekzîb kirin.

Necik



Karmê dar dar ra o.

Vatê Vêrînan Kirdan

Xal Tahir

Vakûrê Kurdistanî di de-wandê hetê corî ra yew merdim beno, namê jê Xal Tahir beno. Xal Tahir teqrîben şestî (60) ser e beño. Xortanêda jê (yey) ra bigî-heta şestî sereyda jê, ne nimaj û ne zî roje girot bi. Yanî wecîbanê dînî nîyano ca.

Rojana rojê aşm da Hêzirano, hêşinayî ya wesârî cay xwi omnânî rê verda bi. Dar û ber o fêkiyên berate detewto, tiwê tiwêran hêdi-na weriyenê. Kelkele mi-yandê hila, qijan (gede, domanî), camêrdanê qertan xwi anto bexçan miyan, bindê siyandê daran dê fêkiyan dê honikan di betiliyayışê yabanî xwi ser a vistêne, semedê hilda şanî arisiyaynê.

Xal Tahir û çend eqerebê xwi keye rast-daşt ra teriq-nenê (sohbet kenê)

Eqrebê Xal Tahirî, Xal Tahirî ra vanê:

Xal Tahir emrê to biyo şeştiy. To hetanî enkay ne nimaj, ne zî roje giroto. To gunewo, ena dinya venga, çewrî rê nêmanena. Kê gerê tikêkê semedê axreta xwi zî bixebeitiyê. Cehnem û Cenê esto. Ci ya ki ma

rê fayde jê bibo desmaj û nimaj o. Ma zanê ti yew insanê do zaf başî, to kerg da yewrî ra kiş nêvato, zirarê to çikesî nêresa wo. Eger ti tikêkê zi axret rê xizmet bikê se, semedê to go zaf rind bo.

Welhasil Xal Tahirî iqnâ-kenê, heme têreyda keye râ-vejiyenê rast vera xwi danê hetê bexçî ra. Ka jîni xwi nizdikê bexçî kerd, Xal Tahir jîni miyana qetîyeno vano:

Eylekînê, şima şorê bexçî miyan, ez zî şona dere di taretê xwi gena û desmaj gena şima dim a yena. Merdimê Xal Tahirî bexçî miyan resay, jîna yewê şono dor de tiwêri ser. Xal Tahir desmaj girotîş ra ki agêra. Eqrebandê xwi ser di agêra va:

Şima roşê. Ez bindê tiwê di nimaj kena û b'adîna yena ma teraqâ xwi demnenê (devam kenê). Xal Tahir şona bindê tiwêri tahta nimajî ver di sewlanê xwi ling ra vejeno, şono tahtî ser dest bide keno ki nimaj biko.

Senî ki qamet keno vano: - Ya rebbî ez enê çeher rikiyatê nimajî taştarı semedê to kena, ti qebûl bikê. Awo ki tiwêri ser o yo vano:

Ez qebûl nêkena! Ena ray Xal Tahir hêrs beno û dadano sewlandê xwi vano.

- Ez qebûl nêkenê qe zî

to kena, ti qebûl bikê.

Awo ki tiwêri ser o yo vano:

- Ez qebûl nêkena! Xal Tahir, xwi pîze di vano:

- Halla-halla, qay mi xelet desmaj giroto, Şono rana desmajê xwi teze keno û rana tepe ağırenero. Yeno tahta nimajî ser, rana qamet keno vano:

- Ya Rebbî ez enê çeher rikiyatê nimajî taştarı semedê to kena, ti qebûl bikê. Awo ki tiwêri ser o yo rana vano:

Ez qebûl nêkena! Xal Tahir rana xwi pîze di vano

- Halla-halla, qay gunê mi piso. Şono dere di xuslê xwi vejeno, ganê xwi pak keno, rana tahta nimajî ser qamet keno vano:

- Ya Rebbî ez enê çeher rikiyatê nimajî taştarı semedê to kena, ti qebûl bikê. Awo ki tiwêri ser o yo vano:

Ez qebûl nêkena! Ena ray Xal Tahir hêrs beno û dadano sewlandê xwi vano.

- Ez qebûl nêkenê qe zî ra meki. Mi xwi ra nêkerdînê eylekan zorakî mi kerdiş da.

Mihem Himbelij

TÎR

Musa Anter



Dewlet û mirov

D i ilmê insanetiye de, dewlet û mirov wek hev in. Ma ji xwe dewlet ne hikûma mirovan e. Di hiqûqê de ji dewletê şexsek qebûl dikir lê, dibên hukmê şexsi. Yanî dewlet wek mîrekî tê hesêb. De içar dewlet hîn bi qerarê dibe wek insanekî. Heyata însen çawa ye, pêşî zarok e dû re dibe xort, dibe zilam, dibe kal û dû re dimire. Dewlet jî wiha ye. Eynî di vê riye de dere û taliya dewletê jî mirin e. Ku ne wiha be berî niha bi deh hezar salan dewlet çêbûne lê, bi hezaran mirin e. Evê niha ku sax in ji hinek zarok in, hinek xort in, hinek zilam in, hinek kal in û hinek jî li ber mirinê ne. Di ilmê dewletê de yê ku hukmê qenc dane, ez du aliman nas dikim; yek jê Yewnanê qedim Aristo ye û yek jî, alîmî İslâmî yê namûdar bi eslî xwe Tûisi ye Îbnî Haldûn e. È-ku van meselan meraq bike min divê kitêba Aristo ya Dewletê û Muqedîma Îbnî Haldûn bixwîne. Gelekî nêzîkî hev in. Ev tiştênu ku min gotin bi xêra wan ez dibêjim. Ez jî wan hîn bûme. De iça divê mirov jî hebekî bi çavên zaneyî li wan û dewletêna dora xwe binêre û qerarekê bide. Vê demê gelek dewletêna zarok çêbûn û hinek jî kirî çêbibin. È ku kirî çêbibin wek Kurdan. Lî yên ku hatine ber mirinê jî hene wek dewleta me ya niha, gerçî min navê dewleta me bi-hure lê ez dinêrim hin bi hin bi allî mirinê ve dere. Serekê xwe dişine Amerika rihet dike, lê li riheti û saxiya dewleta xwe nanêre. Çîma ez wiha dibêjim? De ka ez ji we re

bêjim çî? Dewleta ku nû çêdibe bi şûr û zorê çêdibe yanî eskerî ye. Kes bi selewat û tizbiyan nikare dewletekê çêke. Lê dewleta ku bi şûr hate çêkirin nikare pirr dom bike. Navê wê lê ye, eskerî ye. Eskerî seneetê kuştîni, zorê û yesaxê ye. Èdî miletêk nikare tim di bin vî barî de be. Èdî miletêk bi aqil piştî mide-tekê, dewleta xwe ji destêñ esker derdixin dîkin sivil, yanî medenî. Lê ez dinêrim, Tirkêna me guh nadin vê qâideyê. Ew dibê qey heta serî emê bi şûr û kuştîn û lêxistinê dewleta xwe pê bînin. Ji xwe ji ber vê xeletiya wan, iro di beyreqa reisêcumhûrê me de 16 stêrk hene. Dibên her stêrkek di tarixê de dewlefeke Tirkân e û hîn jî vê xeletiyê qebûl nakin, miraniyê qebûl dîkin. Ama iro ku Fransa, İngîlîz û Alman stêrka li beyreqa reisêcumhûrê xwe bixin stêrkek tenê ye. 16 carî dewleta xwe xera nekirine û ji nû ve wek a berê xelet çênekirine.

Di ilmê dewletan de dibên pêşî dewleta ku nû çêdibe bi qewet e, eskerê wê têra wê heye. Ku gelekî ma miletê wê li ber radibe, hin bi hin eskeriya wê zeyif dibe èdî ew dewleta eskerî ji dewletêne xerîb qewetê dixwazin ku zordesiya xwe hin jî li miletê xwe bikin. Ez çiqasî dinêrim dewleta me ketiye vî halî. Hûn dinêrin ci derdekî me heye em ji dewletêna dora xwe wek Amerika û Ewrûpiyan hewarê dixwazin. Ordiya me digot: "Em karin dinyayê xera bikin." Başwekîlî me Süleyman Demîrel digot ku: "Lazim bibe ezê quba ezmân daxim erdê." Lê iro ez dinêrim ber bêvila wan de tiştê ku tê serê Tirkêna Azerbeycanê û Nahçıvanê ne ordû û ne Süleyman Demîrel nikarin bê vit. Ez fêm dikim ku ew zirtên wan ji bo Kurdistanê bûn. Süleyman bi devê xwe dibêje em nikarin bi Ermenîyan, dinya li piştâ wan e. Tê xuyakirin ku Süleyman li gora hesabê xwe zane ku dinya ne li piştan Kurdan e. Ji vî hawî wek dîkê eloelo xwe li me giş dikir.

È he Süleyman tu kirî bimire û em kirî nû çêbibin. Dinya ne li piştâ me jî be ji ber ku em biheq in Xwedê hevalê me ye û em besi xwe ne. Gerek tu vê qenc fêm bikî.

Dewlet û kontra li alîkî



Edî rengê beyanên dewletê xwe eşkere dikin. Her çiqas di daxuyaniyên xwe de digotin: "Em gel û PKK'ê wekhev nabûn" jî, iro kîrinên wan ên li welat her tiştî eşkere dike. Ji bo wan Kurd Kurd e. Pêwistî bi a-similekirin û ji holê rakirina gelê Kurd dibînin. Gund û bajar valakirin, wêrakirin, şewitandin, bombekirin û koçberkirin polîtikaya wan a hovane derdixe holê. Ji bo wan edî tu ferq di na va gelê Kurd û gerîla de nîn e.

Navenda Nûçeyan- Li Pasûrê, bi bombebarankirina balefir û firokeyên Kobra de, 5 gundî hatin kuştin, 3 kes jî birîndar bûn. Ew êrîş, di 13'ê Çileye de pêk hatibû û hêzên dewletê, di beyanên xwe de, qala kuştina 150 gerîlayî dikirin. Lî di dawiyê de, diyar bû ku êrîş raste rast li gundêni çiya hatine kirin û gundî hatine kuştin.

Di vê bomberanê de, avahiya malbata Îşiyok bi temamî xera bû. Ji bin xerabeyê malê, cendekên Hamît, Halîme, Hava Zaide û zarak 2 salî Abdullah Îşiyok derketin. Ahmet, Edîp Îşiyok û İzzet Turhan jî, bi birîndarî xelas bûn.

ŞIVANEK HATE KUŞTIN

Ji eşîra Berîtanê, şivanekî 17 salî, ji alî leşkerê Tirk ve hate kuştin. Serokê Eşîra Berîtanê Ali Yazıcı li ser vê bûyerê wiha got: "Ji eşîra Berîtanê 50 malbat, vê zivastanê konen xwe, li dorhêla Devegeçidi danîn.

Şivanê me, bê sebeb kuştin. Ev ciyayet e. Demokrasiyi li vî welatî dereweke mezin e."

2 GUND HATIN ŞEWITANDIN

Li Sasonê, mezrayê Horsal û Gomika ji alî hêzên dewletê ve bi çekêni lavî hatin şewitandin.

Hêzên leşkerî, di 17'ê Çileye de, dora mezrayê Horsal û Gomika girtin. Dûre, bang kirin gundiyan kudî li malan legerîn pêk bînin û gundiyan ji malen wan dûr kirin. Hêzên dewletê, pişti ku gundî ji malen xwe derketin, bi çekêni lavî mal û titûnen gundiyan şewitandin. Li Horselê 8, li Gomika 8 mal bi vî awayî hatin şewitandin.

ÇIYAYEN CÛDÎ Û GABAR BOMBEKIRIN

Çiyayen Cûdî û Gabarê, 3 roj li ser hev, bi balefir û firokeyên leşkerî hatin bombekirin. Di vê bombebaranede, hin gundêni qûntara

van ciyayan de jî xesarê dîtin.

Li aliyê din, bombekirina ciyayen Pasûrê, ber bi Hezro yê ve vedikise.

Di bin navê "Tevgera Hundirin" de, ev demeke, ciya û gundêni Kurdistanê bombebaran dibin. Operasyoneke wiha, 10 roj berê li Pasûrê jî dest pê kiribû û 5-6 gundêni çiya hatibûn hilwesandin. Ev operasyona han pêsi ber bi Licê ve, niha jî ber bi Hezroye ve dirêj diebe.

Dewlet di beyanên xwe de van operasyonan, wek êrîşî ser wargehêne gerîla nîşan dide. Lî di rastiyê de, gund têne bombekirin. Armanc, valakirina gundan e.

Gerîlayen li herêmê der barê vê operasyonê de, vê beyanê dan: "Balefirên şer ên dewleta Tirk, li herêmeke fi-reh bombe dibaşının. Li ciya nêzîki 2 mîtroya berf heye. Wargehê me, ne li ser erde ne. Stargehê me hene. Li holekê vekirî wargehêne me nîn in. Weke ku idia dîkin,

Heyeta İHD li Ewrûpa

Heyeta Komeleya Mafen Mirovan, li Ewrûpa dest bi çalakiyên xwe kirin û bi rayedaren dewleten Danîmarka, Norwec, Finlandiya û bi rêxistin û partiyen demokratik re, li hev rûniştin.



1986
İNSAN HAKLARI DERNEĞİ

Di Heyata Komeleya Mafen Mirovan (KMM) de Serok Akin Bîrdal, Yavuz Bînbay, Yusuf Alataş, Fevzi Veznedaroğlu, Ercan Kanar û Yeşil İşleyen hene.

Heyeta KMM'ê, ji bo rawestandina şerê di navbera hêzên PKK û dewleta Tirk de, bi rêxistinê mîna Helsinki Watch, Amnesty İnternasional, Komeleyen Aştiyê, Federasyona Komeleyen mafen mirovan re peyivîn.

Van dewlet û rêxistinê demokratik jî pişti li hevrûniştinan, alikariya xwe diyar kirin. Her wiha Serok Helsinki Watch li Danîmarka Erik Siesby, Seroka Parlementoya Finlandiya ya duduyan Saara-Maria Paakinen jî, destekdayina ji bo rawestandina şerê di nav hêzên PKK'û dewleta Tirk de, dan diyakirin û berdewam-bûna xebat û çalakiyên xwe jî beyan kirin.

Özgür Gündem Xelata Rûmetê stand

Komeleya Rojnamevanen Hemdem (ÇGD) Xelata Rûmetiyê ya sala 1992'an dan rojnameya Özgür Gündem, disa Komele, di şaxê hevpeyvinê de rojnamevanê Özgür Gündem Cevat Korkmaz layiqi xelatî dît.

Weki tê zanîn Özgür Gündem ji ber êrîş û pesta li ser xwe di 15.1.1993'an de navber dabû weşana xwe.

Serokê ÇGD (Komeleya rojnamevanen Hemdem) Mustafa Ekmekçi li ser Gündem wiha peyivî: "rojnameya Özgür Gündem, li welatê ku dibêjin lê demokrasi û serbestiya çapemenî heye mecbûr ma ku navber bide weşana xwe, ji ber êrîş û pêkutiyen ku lê dibûn."

TRT û demokrasiya Tirkîyê

Radyo û televizyona Tirkî TRT, reportaja ku Yalçın Küçük bi Abdullah Öcalan re kiribû, li gor armancen dewletê û bi hin guherînan ve weşand. TRT flîmên vê reportajê ji polis girtibû. Weke tê zanîn, Yalçın Küçük di vegerê de, li balefirgehê hatibû girtin û 2 rojan di bin çav de mabû. Polis dest danibûn ser band û flîmên Yalçın Küçük û der mafê wî de, dawe vekirbûn.

Spikerê programa ku vê reportajê weşand Ertürk Yöndem, bi MİT'ê re di têkiliyê de ye û di hemû programen xwe de, ideolojiya fermî diparêze û li gor bernameya şerê psikolojik bûyeran berevajî dike û diweşine.

Evûqatên Yalçın Küçük, ji bo ev program neyê weşandin, li hemû saziyên dewletê û li TRT'ê murecestan pêk anîn, lê serfiraz nebûn. Program li dijî vîn (îrade) a xwediyê reportajê hate weşandin. Ev jî hovîti û nedemokratiya Tirkîyê eşkere dike û hemû beyanen hebûna demokrasiye derewin derdixe.

Ava Kurdan govenda dagirkeran

Serokwezirê Tirkîyê Süleyman Demirel, ji nû ve berê xwe da Şamê û li ser ava Çemê Feradê û têkoşîna Kurd, bi Hafiz Esad re rûnişt. Daxwazên Tirkîyê ji Sûri, ji bo rîlibergirtina têkoşîna Kurd alîkarî xwestin bû. Sûri jî, ji Tirkîyê, ji bo parvekirina ava Feradê daxwaza peymanekê dîkir.

Weke her carî, serdana heyeta Tirk, di çapemeniyê de, bi demagoji û derewan hate xemilandin. Tirkîyê, hê jî, riya çareserkirina pirsa Kurdî li derve digere. Wilo bawer in ku ne ji desteka (!) Sûri be, dê di rojekê de, vê pirsgirêkê bi metodêne leşkerî hel bikin. Li gorî wan serokatiya PKK'ê li Sûri ye û hemû desteka xwe ji wê digire.

Li gor rojnameyen Tirk, rîveberiya Sûri û Hafiz Esad, ji her carî germtir û bi rûmetdayîneke mezin heyeta Tirk qebûl kirin.

Lê pişti ewqas rûniştin û civînan, tu tişt di nav Tirkîyê û Sûri de nehate imzekirin. Sûri, dawxaza xwe yê hergav ji nû ve anî ziman û ji çemê Feradê bêhtir av xwest. Tirkîyê jî, ji hikûmeta Sûri xwest ku destekê nedin PKK'ê. Sûri beyan kir ku tu desteka wan ji PKK'ê re nîn e. Tirkîyê jî got, "Ev ava ku em didine we besî we ye û ne hewcîyi peymanê ye. Bi vî awayî jî, tu tişt neguherî heta serdaneke din...!"



Hafiz Esad

xelk û gerîla li aliyê din

bombebaran ne li hember me ye. Gundan bombe di-kin. Jixwe armanca wan jî valakirina gundan e."

Li Motkiya Bilisê jî, çiya têne bombebarankirin. Hêzên dewletê vê operasyonê mîna li dij wargehê PKK'ê nişan didin. Lî li gor agahiyê digihê destê me, bombe li gundê herêmê têne barandin.

ÊRÎŞEN KONTRAYAN

Li Nisêbinê, di nav 3 rojan de, 5 kes ji alî kontrayan ve hatin kuştin. Roja 18'Çileyê, kontrayan êrîş bire ser Cemal Uçar û Celal Uçar. Ji herdu birayen Celal Uçar li nexweşxaneya Mêrdinê mir. Cemal Uçar jî bi xedarı, birîndar e. Ev herdu bira li herêmê wek welatparêz di-hatin hezkirin, Li gor agahiyen, êrîş ji alî hizb-i kontra ve pêk hatiye.

Di ceynî rojê de, meleye gundê Arnasê, ji alî hizb-i kontrayan ve hate kuştin. Mele Ebdulwehab, berê jî, ji alî hizb-i kontrayan ve gelek

caran hatibû tehdîtkirin.

Li Nisêbinê, kontrayan li taxâ Abdulkadir Paşa êrîşê birin ser malekê. Di vê êrîşde, Tahir Tekin û birayê wî Celal Tekin kuştin. Ev êrîş jî, ji alî kontrayan ve pêk hat.

Li Farqînê, mirovek, bi navê xwe Mehmet Tokur hate kuştin, ev êrîş ji kîjan hêzî hat, ne kîfî e. Rojnameya Özgür Gündemê piştî girtina xwe jî şehîdek da. Belavkarê Wanê Orhan Karaağar (30) roja 19' Çileyê li ser riya mala xwe hate kuştin.

Xwediyê Rojnameya Özgür Gündemê Yaşar Kaya, li ser kuştina Orhan Karaağar vê beyanê da: "Em êdî qala demokrasiyê nakin, yek alternatifek tenê li ber me û xebatkarêne me heye, ew jî mirin e." Orhan Karaağar, berê jî, ji bo Gündemê belav neke hatibû tehdîd kirin.

Li Diyarbekir 2 xwendavan bi êrîşekê birîndar bûn. Ji xwendevanan Cevat Canpolatten rakirin nexweşxa-

neyê lê, li wir mir, hevalê wî Ramazan Erdem jî, birîndar e.

ÊRÎŞEN GERİLA

Li Mêrdinê, gerîlayen ARGK'ê li dorhêla Masertê (Ömerli) erekbeyen leşkeri xistin kemînê. Di vê êrîşde 5 leşker hatin kuştin, 12 ji birîndar bûn.


Bûyer li nêzî gundê Kafsenar pêk hat.

Li gundê Stewrê Barman û Avîna jî, di nav hêzên dewletê û gerîlayan de, şerek derket. Li gor hin agahiyê herêmê, di vê bûyerê de, gelek leşker hatine kuştin.

Serleşkeriya herêmê 1. û 2. ya PKK'ê Eyaleta Mêrdinê der mafê van bûyeran de, beyanek da. Li gor beyana Serleşkeriya Eyaleta Mêrdinê, di wan bûyeran de 25 leşker hatine kuştin. Beyan wiha diqedede: "Dê li herêmê livbaziyê me bido-me. Emê hemû qereqolan hilweisîn."

Wekî din, li Mêrdinê, bombeyek di erebeya posseye de hate teqandin. Erebe bi temamî imha bû. Kuşti an birîndar nîn in.

Gerîla êvara 18'ê Çileyê bi ser Silopya ve girt û nêzîkî saetekê, avahiyê dewletê bi çekêne giran kutan. Di vê êrîşde, avahiya Emniyetê gelek xesar dît. PKK li ser vê êrîşde beyanek da. Di beyanede, tê gotin ku gelek avahiyê dewletê hatine rûxandin û 6 kes, ji hêzên dewletê birîndar bûne. Li Midyadê, mînîbûseke cerdevanan, ji alî gerîla ve hate gullebarankirin. Di vê gullebaranê de 1 hate kuştin 6 kes jî birîndar bûn. Gerîlayen ARGK'ê li ser vê bûyerê vê beyanê dan. "Ev êrîş bersiva êrîşa wan a ser Suryaniyê welatparêz bû. Me soz dabû gelê xwe ku dê tola wan bê hilanîn Dê şerê me yê li hember wan çeteyen ku xwîna gelê me dirêjin bidome." Li aliyê din, Suryaniyê ku di êrîşa cerdevanan de birîndar bûbûn wiha gotin." Ên ku em gullebarankirin hêzên dewletê û cerdevan in. Li vê nexweşxaneyê jî, li me başnanîn û tedawiya me na-



Şervano tu jî dizanî

Şkeft û berqef ne ji bo peyayî
Lê ji bo siwariyê bûne para me.

kin."

Li Diyarbekir jî, 2 erebeyen polisan, ji alî gerîla ve hatin gullebarankirin. Di vê bûyerê de, 3 kes birîndar bûn.

Li Diyarbekir, li taxên Ofis û Seyrantepe piştî vê bûyerê gelek kes hatin girtin û binçavkirin.

Li Sîrtê 9 cerdevan istîfa kirin. Cerdevan çekêne teslimî qereqolê kirin û wiha gotin: "Bila gelê me efû bîke. Tu şofêr me li erebeyen xwe siwar nedikirin. Xew, xwarin û vexwarin li me heram bûbû. Ger wiha bido-miya, em dê ji birçina bimîrana."

GERİLA ÊRÎŞEN SER HÎZB-Î KONTRAYAN DIDOMİNE

Li Farqînê, di nav heftekê de, 2 kes ji hizb-i kontrayan hatin kuştin. Ji hizb-i kontrayan Osman Güneş, wek serokê vê hêzê dihate nasîn û di gelek cînatyan de, pêçiya wî hebû. Osman Güneş li ber mala

xwe hate kuştin. Dîsa li Farqînê mamosteyek bi navê Kemal Sert, ji alî gerîla ve hate kuştin. Kemal Sert ji wek kontra dihat nasîn.

Li Qoserê (Kızıltepe), li gundê Tumikê, endamekî hizb-i kontra bi navê xwe Süleyman Duyan hate kuştin. Li navenda Qoserê jî, endamekî hizb-i kontra hate kuştin, lê navê wî ne kifî e.

Li aliyê din, 2 cerdevan ji alî gerîla ve, ji Batmanê hatin revandin. Ji cerdevanan M. Emîn Karabulut hate berdan. Gerîlayen cerdevanen din Selahattin Akinci kuştin. Ev herdu kes jî cerdevanen gundê Sasonê bûn.

Dîsa li Batmanê endamekî hizb-i kontra bi navê xwe M. Şah hate kuştin. Erebe-yeke polisan jî, li hêla lojmanen leşkeri yên li Batmanê hate gullebarankirin. Livbazi ji alîye şervanen ARGK'ê ve pêk hat. Agahî der barê kuşti û birîndaran de nîn e. Piştî bûyerê gelek kes hatin girtin.

Endamekî HEP'ê hate kuştin

Enadamê rîveberiya HEP'a Batmanê Mehmet Ertan ji alî kontrayan ve hate kuştin. Mehmet Ertan roja 21'ê Çileyê, sibchê sat di 10.30 an de, li ber derê mala xwe hate kuştin. Ji destpêka sala 1993 an û bi vir ve, 7 kes jî li Batmanê, 24 kes ji aliyê kontrayan ve hatin kuştin. 11 kes jî birîndar bûn.

Ji Partiya Keda Gel (HEP) jî, ji roja avabûna wê heta niha 41 kes, ci endam û ci jî rîveber hatine kuştin.

Partiya Keda Gel, di van rojan de, bi ilanen ku dida rojnameyan vê yekê dihanî ziman û navê 40 kesen ku hatine kuştin diweşand. Mehmet Ertan jî, bû yê 41 an ku ji vê partiyê tê kuştin.

Mehmet Ertan (40) zewicandî û bavê 8 zarokan bû.

Bi kuştina Mchmet Ertan re, eşkere bû ku divê gel li xwe û li zarokên xwe xwedî derkeve. Bi tîrsê û bêdengiyê tu tiş çareser nabe. Dijmin, bêhtir hov dibe û kî were berê dikuje.

HEVKOM ji bo Şîrnex û Cizîrê kampanya vekir

HEVKOM (Komeleya Malbatên Şehîd û Girtiyên Kurdistanê) ji bo alîkariya gelê Şîrnex û Cizîrê kampanyayekê li Finlandiyayê vekir.

Serokê Konfederasyona Parastina Aştiyê li Finlandiya Markku Kangaspuro, da xuyan ku ewê jî besdarî vê kampanyayê bibin û bi HEVKOM û Komeleya Mafen Mirovan (İHD)'ê re çalakiyên xwe bidominin.

Li Finlandiyayê ji bo xurt û berzkirina kampanyayê dê konser çêbibin û hunermendên Finlandiyayı yê bi nav û deng jî besdar bibin. Nivîskarê şanoyê Helena Makela jî, ji bo kampanyayê konsekê çêbice. Makela cara pêşin ji bo Vietnamê çalakiyên wiha çekiribû.

HEVKOM dê ji bo alîkari û piştigiriya gelê Kurd rîexistina Heyva Sor damezirine.

PÊNÜS

Amed Tigris



Çima sewiya ronakbîrêne Kurd wiha nizm e?

Mirov dema guhdariya ronakbîrêne Kurd dike an jî berhemeke wan dixwîne, dibîne ku sewiya wan gelel nizm e. Mirov nikare ronakbîrêne Kurd û yên xelkê bide hember hevûdu.

Çima?

Ji ber ku sedemêne vê yekê yên mezin û sereke hene. Ji bo wê! Mirov dikare van sedeman wiha rêz bike an jî bîne zîmîn.

Pirraniya ronakbîrêne Kurd ji malbatêne nezan û xizan in. Nezanî û xizanî du cinawir in û dema mirov bikeve navbera wan; herdu jî li mirov têne hevûdu dixwin. Pirraniya van ronakbîrêne Kurd gundi ne an jî, ji qesebeven biçûk in. Ev qesebe bi xwe jî gundi têne hesabkirin. Ronakbîrî bi wan dest pê dike. Bav û da-yîkên wan nexwendî ne. Nezan in. Heger hinek ji wan xwenda bin jî ne wiha xwedîyê xwendineke bilind in. Yanî wek xelkê ne bi çend bavêne xwe ve xwenda û ronakbîr in. Ne xwedîyê malbat û mîraseke dûr û dirêj in. Di nav malbateke zana de nejiyane û mezin nebûne. Helbet li Başûr hinek istîsna hene. Lê pirraniya ew kesen wiha her

**Yekîtiya ronakbîrêne
Kurd tune ye. Her kes bi
serê xwe ye an jî du-sê
hevalêne xwe hene. Dînyaya
wan gelek teng e. Wiha li
wan hatiye ku di
berhemêne xwe yên lêkolîni(!)
de jî berê behsa Ehmedê Xanî,
Melayê Cizîri û Celadet Bedirxan
dikin. Piş re dor tê ser Sartre û
Tolstoy û piş re jî navê
du-sê hevalêne xwe
din.**

çiqas Kurd bin jî, ew ne ronakbîrêne Kurd in. Wan esl û feslêne xwe înakir kirine û xizmeta ziman, edebiyat û kultura Tirkî dikin. Kesen wiha nakevin kategoriya ronakbîrêne Kurd.

Tu ronakbîrekî Kurd ji dibistana destpêkê heta universtîte bi zimanê xwe perwerde û hînkirîne nedîtiye. Bibîne jî li gor her sinifi carek mamoste û materyalîn perwerdeye bi Kurdî tune ne. Dema ku mirov bi zimanê xwe perwerde û hînbûne nebîne, wê demê mirov nikare bi zimanê xwe baş bifikire û dîtinêne xwe bi devkî an jî bi nivîskî formule bike. Li derî dibistana jî çavkanyêne xwendin û lêgerînê tune ne ku mirov xwe bi xwe bigihîne. Hişê mirov bi xwendinê fireh û dewlemedend dibe. Bi xwendinê strektûr û formulebûna ziman rûdine. Alfayêne Kurdî yên Latîni û Erebî jî, di vî warî de li pêş ronakbîrêne Kurd bûne asteng û dîwarêne herî bilind û stûr.

Yekîtiya ronakbîrêne Kurd tune ye. Her kes bi serê xwe ye an jî du-sê hevalêne xwe hene. Dînyaya wan gelek teng e. Wiha li wan hatiye ku di berhemêne xwe yên lêkolîni(!) de jî berê behsa Ehmedê Xanî, Melayê Cizîri û Celadet Bedirxan dikin. Piş re dor tê ser Sartre û Tolstoy û piş re jî navê du-sê hevalêne xwe didin. Rêxistîneke wan berhevdu bike ûro tune ye. Yek ji wan re alîkarî û piştgiriyê nake. Berhemêne ku ew di-afîrinin nikarin bi qelîte derbixin. Ji ber ku ronakbîrêne Kurd bi amatorî kar dikin. Hîn jî nivîskar û hunermendêne Kurd xebatêne yên edebî û kulturi ji xwe re nekirne pîse (meslek) û pê ve naxebitin. Her yek karekî xwe dike û di dema vala de jî, bi karê edebî û kulturi ve mijûl dibin. Ji ber vê yekê jî ew di berhem û hunerêne xwe de bi pêş nakevin. Bi ser nakevin. Ne mumkun e ku bi ser bikevin jî. Wê demê encama berhem û hunerêne wan jî bê qelîte derdikeve. Ji aliye din ve dema kar wiha bi amatorî be her tişt tevlîhev jî dibe. Mesela kes xebata xwe li ser beşek bi sînor nake û xwe li ser wî hûr û kûr nake. Her kes dixwaze di her war û cureyê edebî de bixebite û berheman biafirine. Mirov dibîne ku kesek hem roman dinivise û hem rojnamevan e. Hem şanoger (tiyafrovan) û hem jî politîkvan e... Ez serê we ne êşînim, bi kurtayî ew bi her tiştî dizane û dikare.

Piyase û bazara Kurdan ji xwe teng e. Dema bê qelîte û amatorî jî hebe, tengtir dike dergeh û tak (pencere) jî têne girin. Ronakbîrêne Kurd wê demê bê hêvî, bê taqet dimînin. Edî sar dibin. Bi ser re-jî deyndar (qerzdar) dibin.

Vekolanê li ser dengnasî

û peyvsaziya dîrokî ya zimanê

Kurdî û zaravayêne wî

Prof. PIERRE LECOQ

Alîkarîkirin û wergerandina Mamo Cûmî



(4)

Ji nav zaravayêne Îranî tenê zaravayêne navendî pirr nêzîkê Kurdî dibin, eger ne ji kokekê bin. Ka em çend wekhevîna nişan bidin:

1) Bernavêne paşpirti-kî (di Kurmancî de winda bûne): -m, -t, -ş, -man, -tan, -san. Lê Kurdî (Soranî) û zaravayêne navendî bernavê sîyemîn ê tek (î) ye û ê komê (yan e. (Hin zaravayêne navendî (ş) ji Farisi girtine).

2) Pêşpirika berdewam-bûna a "présent" û "imparfait" (bi Farisi "mî" ye) "t" û "d" ye (carina "a-, e-, hwd." ye): bi Mehetâtî et-kir-ûm (dikim), bi Ebayanî e-ker-an, bi Gezî ker-an-ê, bi Erdistanî e-ker-û, hwd. Bi Xûrî de-gen-am (dibînim).

3) Avahiyêne peyvsazî bê êzafê, ango gava rewsek û navek bi hev re werin, mîna Kurdî ne. Bi Qohrudî "kemer bexşedar" (kembera hakimdar), bi Gezî "velg sowz" (belga kesk), bi Verzenî "pêy men" (bavê min), bi Nayînî "zoma padûşah" (z.vayê padîşah), hwd. Kur î (Soranî): Kur-e paşa, Bir-e gewre; bi Ebayanî "sal-e duvumî" (sala duwem); "a" alava mîbûnê ye.

H) Beloçî: Komek zaravane, li başûr-rojhilatê Îranê, li Pakistanê, berwe bakur ta Qutayê, tê dengkirin. Li hin derêne Afganistanê û Tirkmenîstanâ Rûsi jî tê dengkirin. Wêjekî folklorî yî pirr bi vî zimanê heye.

I) Goranî: Komek devokin, li bakur û rojhilatê Kermaşahê: Gewhera (geliye Zemkan, çemê Sîrvanê), Kendule (tenîş Dînewerê), Hewremen (rojhilatê Senendacê), Bacelan (Qesrî

Şêrîn) û herêman Mûsilê. Goranî zimanê wêjeyî yê Ehli Heq e. Dibe Goranî di dîrokê de pirr fireh bû û li ser devokêne Kurdî kartêkîrina xwe hiştî.

J) Zazakî (dimîlî): Kurd bi vî zaravayî dipeyivin, çar-gûse belav bûye: di navbera Zara (herêma Sîwasê, aliye bakur- rojava), Erzinganê (li bakur- rojhilat), Motkî (Betlisê, piyê başûr- rojhilat) û Gergerê (herêma Pirînê (Adiyaman), layê başûr- rojava).

K) Pereçî: Li gundêne çend geliyêne bakurê Kabûlê tê dengkirin. Dibe ji zimanekî Îranî yî rojava hatibe.

L) Ormûrî: Li du deve- ran tê dengkirin: Li Afganîstanê, li başûrê Kabûlê, nêzîkî Berekî Berek (herêma Logarê); li Pakistanê, li Kanîgramê. Gerek ev zimanâ pirr belav bûbe û wekî Pereçî, gerek e ew jî, ji zimanekî Îranî yî rojava be.

Durvîn guhastinê sentaksîk:

A- 1. *mene pîta Semanî: mo piye

2. *heçe mene pîta Talêşî: çeme piye

3. *menehye pîta Beloçî: menî pîs

B- 4. *pîta mene Ebayanî: piye men

5. *pîta heye mene Farişî: pider-ê men

6. *pîta heçe mene

Guhastina tîpa (A) di de-vokêne Azerbaycanê (A2) de, di yên Semnanî (A1) de, di zaravayêne Kaspînê û Beloçî (A3) de, têye dîtin.

Tenê Kurdî û zaravayêne navendî li avahiya (B4) di-kevin, lê zaravayêne navendî avahiya xwe ya êzafê ne ji mêj ji Farisi girtine.

Kurdî avahiyêne xwe ji Farisi negirtine ji ber ku êzafâ Kurdî bi nêr û mîyi xwe ve, jê cuda dibe. Zimanê Parisi ji berê de cuda-hiya nêrî û mîyi û hejmârî, berî dema Sasaniyan (3 sed sal pişti Zayînî), jê hatiye avêtîn: hesp-ê min, me-hîn-a min, hesp-ên min.

Zazakî û Goranî jî êzafê nas dikin:

Hewramî: kitêb-î siyaw

kinaç-ê zerîfe

kinaç-ê zerîfê

Siwêrek: her-ê to

ray-a ma

postal-ê min

ray-ê min

Lê bernavêne kesane di Zazakî de tîpa (A2) tînin bîra me:

nêr: jey; mî: jay; kom: jê (<*heçe eveyhe, hwd.): dergûşa jey raşan ê biza jay kilm a piyê jê qaçiqan weşo merdo?

Ev jî cihê Zazakî di nava zimanêne Îranî yên rojava de çetin dike.

REWŞEN DERDIKEVE

Hejmara Taybetî (154 rûpel) ya kovara Rew en (organa YRWK-Ewrûpa) di demeke nêzîk de di nava desten xwende-vanan de ye.

Bêhtirî 50 nivîskar ji her çar parçeyen Kurdistanê di nivîsandina wê de cih gir-

Di dîroka Kurdistanê de, gelek serhildan çebûne. Di van serhildan de, xwîna gelê Kurd mîna çeman herikiye. Mixabin ku ew xwîn jî bi alîkariya Kurden xayîn û nezan hatiye rijandin.

Di serhildana Şêx Seîd de, çiqas alîkar hebûn ji wan bêhtir xayîn jî hebûn. Alîkarek ji wan ê hêja û bedew Cemîlê Seyda bû. Ji bo ku xwendevanê Kurd nas bikin û dîroka xwe hîn bibin me ev hevpeyvin pêk anî. Têkil lawê Cemîlê Seyda ye. Emrê wî heşte û yek sal e. Bi bavê xwe re di bûyeran de cih standiye.

Apê M.E.Q. me bihist ku bavê te Cemîlê Seyda, bi Şêx Seîd re li hemberi dewletê ketiye şer. Berî her tiştî ji kerema xwere, Cemîlê Seyda bi me bide naskirin.

-Birazî, ji kalikê min re di gotin Seydayê Licî. Zanayekî gelekî mezîn bû. Bavê min Cemîlê Seyda jî, mîna wî xwendevan û zanayekî pirr pêşketî bû. Di nav gel de pirr hatibû naskirin.

Berî ku Cemîlê Seyda di serhildana Şêx Seîd de cih bigire karê wî ci bû? Tu dikari ji wî demê xeber bidî?

-Berî ku bi Şêx Seîd re bîkevê şer, dîsa mahkûmê Tirkan bû. Li welatê Serhedê du cendirmê kuştibû. Girtin û anîn. Kirin girtîgeha (hepsa) Amedê (Diyarbekirê). Hijdeh sal danê. Ew û Eminê Perîxanê hevalê hev ê girtîgehê bûn. Eskerek ji paywanê (nobetçi) girtîgehê ji Licî bû. Cemîlê Seyda û Eminê Perîxanê bi alîkariya wî eskerî ji girtîgeha Amedê reviyan.

Ez dixwazim em werin serhildana Şêx Seîd. Serhildan çawa dest pê kir?

-Mustafa Kemal bi alîkariya Kurdan, dijmin kire der. Piş re dest bi qanûnê nû kir. Mafên Kurdan avêtin pişt guhê xwe. Ji aliye din ve jî dest bi şexan û oldaran (dîndaran) kir. Yek bi yek ji holê rakirin.

Seyid Evdilqadir, lawê Şêx Ubeydullahê Nehri li Stenbolê bû. Sand ji Şêx Seîd re got: "Hal û mesela Mustafa Kemal ev... Ez li vir girtî me. Bê ma tu çarekê naki?"

Şêx Seîd rabû ji Xûnisê bî ket. Hate Piranê (Dicle). Haya Şêx Seîd ji şer nîn e. Daxwaza wî ku gel şiyar bike û rewşa Türkiye bi gel bide zanîn. Li Piranê gelek mirov hatine serdana wî. Di nav wan serdanvîyan de hinek mahkûm jî hebûn. Yek ji Piranê rabû çû giliye wan mahkûman kir. Esker hatin ku wan bigirin. Şêx Evdirrehîm, birayê



Kurê alîkarê Şêx Seîd Cemîl Seyda rûpelekî ji dîroka Kurdistanê ronahî dike

Cemîlê Seyda ji nav dexlê derket

Agir li cilê wî dileyîst

Çend gav avêtin û

Berê reşas û tivingan lê rast kirin

Li wir kuştin...

Şêx Seîd nehişt ku esker wan bibe. Esker kar kirin ku destevala vegeerin. Gilîvan got: "Ku hûn wan negirin, ezê giliye we jî bikim." Esker car din vegeryan û dora mahkûma girtin. Mahkûma xwe nedane dest û bi esker re ketine şer. Esker hemû kuştin. Ji ber ve yekê Şêx Seîd, ji mecbûr kete şer.

Hê Şêx Seîd kar û barê xwe nekiribû, ji ber wan mahkûman kete şer ne wilô?

-Belê! Ew digeriya ku pêşî gel şiyar bike. Lî ne weke hesabê wî çebû.

Ji Piranê hate Licê. Cemîlê Seyda bi gelek Liciyan re, bi Şêx Seîd re di kar bû. Meşîne

ser Amedê. Şerekî pirr giran çebû. Sê caran li eskerê Şêx Seîd, eşîren Kurdan, bi Tirkan re hatine ser Şêx Seîd. Reda Şêx Seîd û eskerê wî birin. Amed ber dan û xwe li gundê Elîbordoxa girtin.

Cemîlê Seyda got: "Şêx min, Ereb û Kurmanc ji hev kifş in. Ereb ku di şer de şikesîn, direvin. Lî ku li wan dibê firehî, dîsa vedigerin. Heçî Kurmanc in, narevin, heta ku neyêne kuştır. Ku direvin jî tu carî venagerin. Vêca tu bi ya min bike, ez ji Mêrdînê heta bigîhê Cizîrê nas dikim. Ezê te li wir xilas bikim." Çend gire gir û axayên jorê gotin:

"Na... Emê biçine Îranê. Da em dîsa karibin vegeerin axa xwe." Şêx Seîd bi ya wan kir û kete rê. Di nîvî rî de, Qasim Begê lawê Ehmedê Silêmanê Cibrî bi eskerê Tirkan-re kete pêsiya wan. Şêx Seîd û hevalên wî girtin. Anîne Amedê. Şêx Seîd bi cil û heşt hevalê wî ve daleqandin.

Pist re Cemîlê Seyda ci kir?

-Cemîlê Seyda bi du hevalê xwe re berê xwe da dora Mêrdînê. Hevalek ji yê wî, ni-vîsîrê (katib) Şêx Seîd, Fehmî bû. Hatine Qasrika çiyayê Mazi. Kurmancê xayîn li wir havirdora wan girtin. Cemîlê Seyda dengê li mezinê Qasrikê

Evdalê Hecî di nav wan kesan de, kir. Bankirê û got: "Wa Evdalê Hecî te ez nas nekrim?" Evdalê Hecî jî ew nas kir. Hate balê. Çûne dest û ruyê hev. Evdalê Hecî çend zilamê xwe bi wan re kar kîrin. Ji wir hatine Biroka. Ji Biroka derbasî binya Xetê bûn. Çûne Sûrî. Ji 1925 an heta 1937 an li binya Xetê man.

Rojekê fermandarek ji yê Tirkî, bi eslê xwe Kurmancê Meletê (Malatya), hate binya Xetê. Navê wî Ziya bû. Xwe li Şêx Evdirrehîm girt. Got: "Ez ji ber Tirkan reviyam û ez hâtime ba we." Şêx Evdirrehîm lê êmin bû. Rabûn bi hev re hatine Qamişlokê. Bankirin Cemîlê Seyda, Şêx Mizbeh, Hiseynê Eli Begê Stewrî û lawê Seyidxan. Li Serxetê Mala Eliye Ünis û Seyid Rizo bi Tirkan re şer dikin. Karê xwe kirin ku herin alî war.

Bûne çardeh kes. Çekê xwe dane milê xwe û serxet bûn. Hatin, gihane dora Bismîlê. Heyva Temûzê (Tirmehê) ye. Dinya pirr germ e. Li wan bû roj. Ketiñ nava geniman û raketin. Dexil hişk bûne. Pişti ku ketine xewê, fermandar Ziya xwe vedizi û çû qereqola Saletê. Esker anîn û hawîrdorê wan girtin. Telefon dane Amedê û Silîva. Esker bi ser wan ve rijiya. Rabûn ketine şer. Esker li hember wan tiştek nekir. Nêrîn ku şev bi ser wan de were wê xelas bibin, Kurmancê ku bi wan re hatine şerê wan aqil dane esker. Üsivê Rihîmê û Emerê Kop gotin: "Agir berdine dexlê. Ku ne wilô be, çare nabe." Esker bi ya wan kir. Agir berdane dexlê. Hinek ji wan di nav agir de man, şewitîn. Hinek ji wan jî, çaxa ku derketin, hatine kuştin. Cemîlê Seyda, ji nav dexlê derket. Agir li cilê wî dileyîst. Çend gav-neavêtin û berê reşas û tivingan lê rast kirin. Li wir kuştin.

Hiseynê Eli Beg û lawê Seyidxan xelas bûn. Hatine A-lûzê. Hiseyn got: "Xelkê van gundan min nas dikin. Ka rextê xwe û tivinga xwe deyne û here nâva gund bê ma tu nan ji bo me nayîne." Lawê Seyidxan rabû çû nava gund. Li derikî da û nan xwest. Dewsâ rext li cilê lawê Seyidxan xuya bû. Gundiyân girtin, birin, Hiseynê Eli Begê jî anîn balê. Her du li wir kuştin.

Tirkan tiştek nekiriye. Xuya dike ku giş Kurmancan kiriye. Erê birazî... Ne belaş gotine: "Kurmanc weke kew e. Kew ji dijminê eslê xwe ye."

Apê M.E.Q. ji bo vê hevpeyvin em gelekî spas dikin.

Heypeyvîn: Jîr Dilovan

Ordixanê Kaşaxî (Apê Ordî) tenê sê salan çûye dibistanê, paşê heta koma 8'an çûye dibistana karkeran ya şevê. Kesk qebûl nake ku, Apê Ordî deh fakulte neqedandine. Mirov nizane Apê Ordî dîrokzan e yan etnograf e, yan jî helbestvan e. Hema bêje kêm-zêde di her wareki de xwedî zanîn e.

Di nava saetekê de Apê Ordî dikare li ser sed pirsan jî xeber bide. Ji dîroka Medan dest pê dike û heta li ser taybetiyê milîtanê PKK ê jî xeber dide. Eger kêmâniyekê Apê Ordî hebe, ew jî ev e: Apê Ordî ji xeberdanê naweste, pirr pirr deng dike û pirr hindik mecalê dide ku yê li hember wî jî çend gotinan bêje.

Temenê (umrê) Apê Ordî niha 58 sal in. Lê bi rihê xwe ve, bi dinamîzma xwe, tu dibê belkî xortekî 20 salî ye. Tim bi moral e, bi hêvî ye û dilgerm e. Bi qasî xortekî dikare bibeze, herdem ji ser re amade ye û çavên wî jî keseki naşkin.

Apê Ordî li dijê her tişteki dogmatik opozisyon e, ne ev tenê lê belê opozisyon opozisyonê bixwe ye jî. Apê Ordî wiha jî li dijî şexsiyeta Kurdi ya kole û şexsiyeta ne xwedî otorite û insiyativ e. Çi kar û delametên zor bikevin ser milen wî jî, xwe virde-wirde nade, bi hesanî hemû karêna xwe pêk tîne. Apê Ordî ji zoriyê natirse û zora hemû nexweşîyan dibe.

Li her derekê Apê Ordî rûne, hema zû hemû dengkirinê vala digre û wê civînê vedigerîne li ser pirsên welat û gel. Derd û kulên xwe jî rîz dike: "Ez evîndar im, evîndarê welatê bav û kalan im. Hêviya min vegera welat e. Ji dema pêşî ve, ku min navê PKK bi-hîst û heta vê rojê dilê min ji bo vegera welat lê dixe. Ez bawer im ku, ev keda PKK dike wê me bigihîne xelasiyê, derfet nîn e nagihîje armanca xwe. Ez vê dawiyê çûme bakûrê Kurdistanê û basûrê-rojavayê Kurdistanê, nava Kurdîn Sûriyê. Bi rastî inçex mirov dikaribû wan tiştan di xewnen şevan de bîdita. Herkes, jîn, zarok û mérén mezîn tev bi siyasetê ve mijûl dibin. Her yek rojê sed karan ji bo gelê xwe dike. Tu bi ku ve herî, bi kêt re deng bikî tenê yek pîrs heye, pîrsa avakirina Kurdistanê ye. Edî gotina tîrsê li cem wan nemaye. Li vira niha ez derdê zarêne me dikişnim, bi xortan re gelek teng dibim. Heta mirov bi wan ve, neqîre nizanîn karekî bikim. Niha rast e hêdi hêdi têne guhertin û ez bawer im ku ev prosesa guhertina wan wê xurt û bi lez pêşve here. Serbilindiyeke mezîn e ku iro PKK di nava me de pirsên jiyana me yêne pêşerojê çareser dike. Baweriya min li ser vê yekê jî ew e, ci cihê PKK tê de dest bi xebatê dike, li wir rûpelîn jiyaneke nû vedi bin."

Apê Ordî di sala 1934'an de li gundê Dozkendê navçeya Talînê li Ermenîstanê hatîye dinê. Hîna temenê (emrê) wî sê sal bûn dê û bavêne wî hatîne Gürçistanê, li bajarê Tibîlîse bi cih û war bûne. Vê rojê Apê Ordî bavê pênc kurâ e. Li taxa Orteçalê, pirr nêzîki meydana Eceman diji.

Ferhenga Apê Ordî fireh dibe,



Apê Ordî (Ordixanê Kaşaxî) Gürçistan-Tibîlîse

Wêne: Welat

'Bila şemsê me APO biparêze'

R. Cîzre ji Tibîlîse dînivîse

van rojan gotina "Heval" tê de cihê xwe girtiye û hema edî Apê Ordî ji Gürç, File, Ecem û Rûsan re jî dibêje: Heval! Dema vê dawiyê disa em rastê hev hatin wiha dijot, "Binêrin heval! Ev e nêzîki 60 salan e ez li Tibîlîse dijim. Lê heta vê rojê jî kî ji min dipirse Apê Ordî tu ji ku derê yî? Ez dibêjim: "Em ji bakurê Kurdistanê, navçaya Surmeliyê ji gundê Tendorekê ne. Heval! Zanibin ez yekî ji we me, bi hemû tiştîn xwe ve, ez di riya we de amade me".

Apê Ordî niha pênc zimanân dizane ew jî ev in: Kurdi, Rûsi, Gürç, Filehî (Ermenî) û Ecemî (Azerî). Li ser vê yekê jî wiha dijot, "Mirov kijan zimanî bizanibe, ew feyde ye. Di nav jiyana rojê de lazim dibin. Lê li ba min di ser her tiştî re, ez bi zimanê Kurdi serbîlind im. Ji ber ku zimanê dayîka min ez hîn kirime. Zimanê Kurdi, zimanê dilê min e, zimanê xwîna min e. Li ba min zimanên gelên din tev di yek derecye de ne. Lê dikarim bêjim, baweriya min bi zimanê min heye. Ji zimanê xwe pirr hez dikim."

Apê Ordî ji rastiyê hez dike. Bi cesaret xeber dide. Tiştî bawer neke yekser dibêje ev ne rast e. Ji mirov rastgo û paqîj hez dike.

Di vî warî de jî dibêje: "Her yek gerek e karê xwe di demê de bike, rast rûne û rast xeber bide. Herkes pêwist e lingê xwe bi qasî berra xwe dirêj bike. Mirov bi derewan nikare bigihîje cihêkî. Mirov bi ki-

rinê xwe û hunerên xwe xuya dike. Madem Xudê em Kurd dane, halê Kurdan jî ev e divê em şev û roj bixebeitin. Milet hızî bi gotinê vale nabe. Rast e min dibistan û unîversîte nexwendine, lê hema ji serpêhatiyê jiyanê ez fêri gelektiştan bûme."

Apê Ordî her rojê sed caran ke-serên vegera Kurdistanê dikişîne. Ji dûriya welat û biyaniyê nefret dike, "Hema edî keseki ji me re negotâ hûn li welatê me mîvan in bes bû. Bila roja ez herim Kurdistanê, hema wê rojê bi xwe Xwedê rîhê min bistîne, disa ezê geleki kîfxweş bibim."

Apê Ordî car caran kul û derdîn xwe, bir û baweriyê xwe dike helbesten gelêrî û di civatan de dibêje. Berî ku ji me re helbesteke xwe bixwîne wiha dijot: "Ez ji durûtiyê hez nakim. Gerek e gotinê mirovan ne tenê ji lîvîn wan derkevin, mirov pêwist e ji dilê xwe xeber bide. Herkes ji PKK'ê hez dike ji ber ku gotin û ideolojiya PKK'ê bi kar û têkoşînê ve girêdayî ye. Pirsên xwe raste rast dibêje û dike. Li ser mirovan bi şev û rojan xeber didin, lê qet fedekariyê nakan binêrin min ci gotiye û pêre pêre helbesteke dirêj dixwîne:

Milethizî birê delal
Ne isbat e gotina zar
Gerek dil be sidqê zelal
.....
Pirsên me yêne li ser serokatiya

KK'ê ji bo Tevgera Rîzgariya

Neteweya Kurdistanê ji Apê Ordî wiha bersiv didan: "Ev e 12 sal in ez kêm-zêde PKK nas dikim. Li ku derê gotinek li ser welatê min hebe bi lez dixwînim. Min Şeref-name xwendîye û baş dizanîm ku ev e hezar sal in ji bêtifaqiyê em paşve mane û herkesi em xapandîne. Raman û bir û baweriyê PKK min geleki dikşînîn ber bi xwe de. Eger vê rojê bi milyonan gelê me radibe ser piyan û dibêje: Biji PKK, Biji Serok Apo. Gerek e herkes fam bike ku edî gelê me riya rastiyê dîtiye û li dora xeta PKK'ê xwe kiriye yek. Ev ji bo min şahiyeke geleki mezîn e.

"Salên berê mirovên diçûn dihatin Tirkîyê digotin: Kurd li Tirkîyê tev asîmîle bûne. Ji riya Kurdiyê derketine, lewma agir bî dilê min diket. Lê elhemdulillah vê rojê PKK, gelê me ji riya mirinê vegehandiye. Bila Xwedê sihetê bide Apo, bila şemsê(*) me Apo biparêze.

"Salên berê gelek mirov ji Ewrûpa dihatin li ba me, tevan li dijî PKK'ê xeber didan. Lê ez apê we me, min meremên wan fam dikirin. Min dizanibû ku ew ji bo cihê xwe yê germ ku li Ewrûpa çekirine, wan tiştan dibêjin."

PKK mîletê me ji xewê rakir. Hikmê xwe li ser mîletê me yê li vir jî kir. Em hisyar kîrin û hezkirina welat û gel kire dilê me de, tifaqî û tiştîn baş anîne nava me."

Hedera Apê Ordî nayê, dixwaze rojekê serok Apo bibîne û ev

daxwaza xwe ji me re tim digot: "Eger rojekê ez Serok bibînim bawer bikin ji şabûnê ezê nizanibim tişteki bêjim. Lê hema baweriya min e ku ezê ji 60 salî vegherim 40 saliya xwe. Ezê serok demekî dirêj hembêz bikim û bi navê él û eşîra xwe silav bikim."

"Bila heta tav û sih hebe, PKK ji hebe. Bila Xwedê destê PKK xurt bike û gelê me ji bigihîje serxwebûn û azadiyê."

Apê Ordî disa ji me re helbestekê dixwîne, ji serî ta binî bi helbesta xwe re dibe yek. Ev tenê parçeyekî wê helbestê ye:

Nor ji nedira xas e
Parve kir erd û ezman
Esîr reben ji xewê rakir
Ji xewa giran guhast zeman
.....

Dawiya dengkirinê nikare were, Apê Ordî tim behsa serpêhatiyê xwe dike, dibêje: "Dema min vê dawiyê şahiya 15'ê Tebaxê dît, bawer bike di nava min û Xwedê de tenê bostek erd ma. Hêstirên şabûnê ji çavê min hatin."

Disa dem derbas dibe, lê dawiyâ dengkirinê nayê, lewma em û Apê Ordî neçar in xatirê xwe ji we bixwazin, xwendevanê delal.

(*) Gotina Şems di bingeha xwe de gotineke Yûnanî ya kevin e. Ev gotin tê wateya roj (güneş). Kurdîn êzidi ji rojê re dibêjîn şems û ew semboleke pîroz ya dînê wan e. Pê sond dixun û xwe davêjin bextê 'şems' di demê zor de.

JI RAYA GIŞTÎ RE

Partiya me, ji bo bexteweriya gelan, ji holêrakirina vê sazûmana şêlandin û zilmê û ji bo bibe alternatîva vê sîstemê hate avakirin, ji partiyên din cihê ye û xwedî bernameyeke xweser e. Partiya me, li kêleka gelek pirsgirêkên Tirkîyê, bi taybetî ji bo azadî û demokrasiyê têkoşîna xwe didomîne.

Endam û rêvebirên me yên ku di vê têkoşînê de şehîd ketine ev in:

Wedat Aydin, Remzi İl, Harbi Arman, Abdurrahman Sögüt,
Ahmet Turan, İsmail Irmak, Sıddık Tan, Ekrem Güran, Musa Anter,
Hüseyin Deniz, Abdulsamet Sakık, Nedim Balyacı,
İsmail Hakkı Kocakaya, Tahir Seyhan, Mehmet Demir,
Mehmet Sait Erten, Abdülkadir Kişi, Selim Bingöl, Mehdi Demir,
Mevlüt Argın, Şahin Alpan, Adil Yazıcı, Nezih Doğan, Ekrem Gürnү,
A. Sıddık Turhalla, Sait Menteş, Mehmet Emin Narin,
Şurdan Demirkapı, İdris Çelik, Yusuf Solmaz, Misbah Doğru,
Abdülsamet Çetin, Nihat Mazhar, Felemez Güneş, Bahattin Turan,
Behzat Özkan, Zülfükâr Yağan, Nevzat Kelekçi, Havzi Ekinci,
Mustafa Atan, Mehmet Ertan

Em endam û rêvebirên xwe, bi rehmet û rêzbûnê bi bîr tînin.



SEROKATIYA GIŞTÎ YA PARTIYA KEDA GEL (HEP)

Em şer naxwazin

Em zarokên Kurdan e
Çelye şer û merdan e
îro em bindest mane
Ey dinya em şer naxwazin

Em kuşkê sor û şin in
Ji bo em biharê bibinîn
Li bistanê da bixwînîn
Ey dinya em şer naxwazin

Em biçük in şîr dimijin
Bi bombê jehrê me dikujin
Dil û hinav li me dibrijin
Ey dinya em şer naxwazin

Ma gelo súcê me ci ya?
Qey súcê me Kurdiya
Me hê ruyê dînyê nedîya
Ey dinya em şer naxwazin

Me di bin tanqan de
diperçiqin
Heta kengî vê işkencê
bibinîn
Ma qey mafê mirovan me
nabînîn
Ey dinya em şer naxwazin

Dibe heya mafê mirov
Gule dibarin wek bîzr û tov
Ma me nabînîn ev hirç û
hov
Ey dinya em şer naxwazin

Heqê me ye ger û lîstik
Zarok kuştin hewek destik
Laşan danîne ber hev
bi ristik
Ey dinya em şer naxwazin

Dijmin hov û gurê har in
Xwîna zarokan vexwarin
Zarok bi qîr û hawar in
Ey dinya em şer naxwazin

Çav bi hêstir û girin e
Em nexweş in, derman
nîn e
Bêxwarin in em birçî ne
Ey dinya em şer naxwazin

Em in kuşkê hê nû vebûwî
Jiyan nexweş bû li ber vi
duwî
Heqê insanê ma ka tu
li kuwî
Ey dinya em şer naxwazin

Ji jor ve têñ bombe û
gaz in
Ji bo ku em serbest razîn
Ji dînyayê em yardımê
dixwazin
Ey dinya em şer naxwazin

Tirk im doğryum bi me
dibêjin
Vê zilma pîs ji ser me
bavêjin
Ma guneha em bi zimanê
xwe bêjin
Ey dinya em şer naxwazin

Ez jî insan im bi zimanê xwe
bixwînim
Ez jî insan im bi zimanê xwe
binivîsinim
Ez jî insan im bi zimanê xwe
bistirînim
Ey dinya em şer naxwazin

Mehmet Salih Alptekin
Dalin / Midyat

Rojekê rovî ji, jûjî re dibêje: "Were em bi hev re şirî
katiyekê bikin. Tevî hev
cot bajon."

Jûjî ji gotinêñ rovî ji xwe
re baş dibîne û pêşniyara
rovî qebûl dike.

Jûjî: "Bila be, em bi hev
re vî karî bikin."

Rovî û jûjî dest bi xeba
ta xwe dikin, şûvê dajon,
genim tov dikin. Li zeviya
xwe xwedî dertên, lê
dinêrin. Debra wan şin di
be simbilê genimê wan
diseride, roj bi roj ber bi ci
nandinê ve distewe. Rovî
û jûjiyê me dest bi çinân
dina genimê xwe dikin. Tî
nin ser bêndera gund û
gêle dikin. Hemû karê
xwe diqedîrin. Edî dema
ku genimê xwe li hev

parê bikin tê.

Rovî: "Birayê jûjî em dê
debra xwe bi vî awayî li
hev parê bikin.. Kî ji me
serê sibê, beriya ber
bangê bigihîje ser ben
derê, genim ê wî ye."

Jûjî: "Eman gewa dibe,
wisa nabe. Tu dizanî ez ni
karîm wekî te bibezi. Ev
kirina te ne Xwedanî ye,
ne mîna biratiyê ye, bi
rakê rovî."


Rovî: "Tu dizanî min ji te
re got ku wiha nebe ez ji
qebûl nakim."

Jûjiyê me bêçare ma û
fikra roviyê fenek qebûl

kir. Jûjî li malê ji xwe re di
keve xeyalan, diponije. Ji
xwe re dibêje: "Ez dê ca
wa bikim? Nabe ez dê ji
niha ve bikevime rî. He
tanî serê sibê, bi zorê ez
xwe bigihînim benderê."

Roviye me yê fenek, li
malê bi ken û gewz e.
Mad û mirûzê wî pirr xwe
e. Ji xwe re dibêje: "Min
çewayî jûjî kir. Min ew xa
pand. De felek ji bibe ba
vî wî, ew dikare beriya
min xwe bigihîne bê
derê."

Jûjiyê ji, ji êvarê ve di
keve rî û ber bi bênderê



ve rî dikudîne. Beriya
tirêjîn tavê xwe digihîne
bênderê û xwe dibînê ge
nim de vedîsêre.

Rovî ji, li ser dilê rihet di
keve rî. Di rî de dide lotik
û çindikan, ji kîfan nizane
çibile.

Rovî: "Genim tev êdî yê
min e. Dê jûjî ji ku ve beri
ya min xwe bigihîne bê
derê."

Roviye fenek xwe digi
hîne bênderê.

Li der û dora xwe
dinêre tu kes nîn e. Çivîk ji
naçukînin. His û pisa tu
benderihêkî ji nayê. Rovî
biskekê li ser bênderê ji, ji
xwe re kîf dike, çindikî li
vî alî dixe lotikî li wî alî di
xe heta ku ji pertav dike
ve pişti ku diweste, dixwa
ze, ji xwe re li cihekî rûnê.

Roviye me haya wî ji
bayê felekê tune, diçê
cihê ku jûjî xwe veşartîye,
lê rûdinê. Jûjî qet dengê
xwe naake û xwe naleqîne.
Lê rovî vite vit ketiyê, ji
gewz û kîfan di cihê xwe
de natebite. Rovî dest bi
peyvandinê dike û ji Jûjî
dipeyive. Jûjî ji ber
peyvîn rovî xwe ranagi
re. Kelem û striyên xwe di
qûna rovî de radike. Care
car ji ber jana strî û ke
lemeñ jûjî, ji rovî diçe.

Jûjî: "Ey roviyo! Tu çiqas
fenek bî, ji te fenektir ji he
ne di vê dinya derewîn
de." Dibêje ji roviye xasûk
re.

Berhevkar: Zana Farqînî

Pirsokêñ (tiştonek - nizanok) Kurdan

Çanda Kurdî pîr dewle
mend e. Lî mixabin, ji ber
ku wêjandina ziman qedex
xe bû, heta weke îro ber bi
hev nehatîye. Dijmin, dîlok,
stran, çîrok, leyîstik û he
bûnê me yê çandî, bi alî
kariya ronakbîrê me yê
xwefiroş ji bo xwe kirine mal.
Bist salê min li ser dîlan (folklor)
û çanda Kurdî qedîya
ne. Ev hifdeh salê min e ku
ez mamostetiya zimanê Tirkî
dikim. Di vê dema borî de
ez xweş hîn bûm ku gelej ji
dîlan û çanda Tirkan giş yê
me ne. Ew hebûnê me giş
ji alîyê hunermend, deng
bêj û ronakbîrê Kurd ve
wergerandî Tirkî bûne.

Nîha peywîreke (wezîfe
ke) mezin ketiye ser milê
me Kurdan. Divê ku em bi
zanayî û pêşverûyî wêjê ya
xwe ya bi devkî bidîne hev.
Wan berhev kin û di rojna

meyen Kurdî de çap bikin.
Bi vê pêwanê em wan ji re
şâhiyê û ji windahiyê xilas
bikin.

Ji bo xwendevanan
çend pirsokêñ me, ji dora
Midyadê ku min ew ber
hevkirine pêşkêş dikim:

1) Ker zîrî pişkul (mîskul) firî

2) Ji tiştan ne tu tişt e, lê
belê didan (diran) xişt e.

3) Bê rîh e (can e) riha di
bezînê.

4) Şikeftika tarî ye tîjî mihê
(miyê) spî ye.

5) Tiştekî min heye dixwe
narî.

6) Bin wê behr e ser wê
agir.

7) Guhê mîsk tîjî risk.

8) Sîma gê tîjî xwê.

9) Ji hingîv şîfrîntir e, tiştekî
jê ne xweşir e, tehl e weke
zilindar, gelkan ji xwe re di
ke neyar.

10) Tûj e weke şûr, xweş e

weke bilûr.

11) Tu bixwî dikeve ber
dinanan (diran) tu nexwî
gul û guflstan e.

12) Werîsê badayî bi
gokê ve girêdayî.

13) Lî dixin hişk e dar e,
nagîrî nake hawar e.

14) Zilamekî dirêj pîrekeke
kin, bi şev û roj bi rî ve di
çin, ne rûdinêne ne disekinin.

15) Sêv ke min heye ge
lek xweş, nîvî spî nîvî reş.

16) Goşt e kanî jê tê
xwar, gelek xweş e min tê
vexwar.

17) Şaşik li ser sera ye,
bang dide né mela ye.

18) Pîr çeleng û xebat
kar e, dexlê dide hev ji he
mû deran, ne parsek e ne
rêncber e.

19) Qolana li pişte ye,
dendik tê de bi rêzê ye.

20) Du şibakê bê derî, bi
şev girî bi roj vekirî.

21) Vî alî dîwar e, wî alî
dîwar e, di nav de sekî har
e.

22) Tiştekî min heye bi rî
de diçê neqşan dike.


23) Hilindir milindir, kur ji
bavê bilindir.

24) Hewşika tengik tîjî leş
kerê kinik.

25) Ji vir heta Helebê, he
mî têlê qesebê.

1) Tiving 2) Pêşî, kelmêş
3) Gû 4) Dev 5) Qîrnî 6) Lam
pe 7) Hêjîr 8) Hinar 9) Ziman
10) Ziman 11) Dendik 12) Kezî
13) Goka holê (Holê, leyîstî
ka Kurdan e, bi çeman tê
leyîstîn) 14) Rojpiyan, saet
15) Şev û roj 16) Memik û şîr
17) Dîk 18) Mîro, mûrî
19) Rextê fişekan 20) Çav
21) Ziman û diran 22) Dewsa
şekalê 23) Agir û dûxan
24) Derbik, qıştik 25) Tîrêjê
rojê

Berhevkar: Jîr Dilovan



*Turgut Özal, Haşim Haşimî û
gelê Cizîrê*



Hasimî, Özal li Cizîrê dawetî şemetokê kir

Serokatiya belediya Cizîrê, di çi wateyî de ye? Di nav we û serokên belediyêن Tirkiyê de, ci cihêrengî hene?

- Divê serokên ku ji alî gel ve têne hilbijartîn, bi hemû pîrsîrêkên gel ve têkîdar bibin. Bi taybetî, ku mirov serokê Belediya Cizîrê be....Seroktiya me, naşibe tu serokatiyêñ belediyeyêñ dînyayê. Gel hemû meseleyêñ xwe tîne serokatiya bele-

paqîjî, rê û xizmetên avakirina bînerdî dixwest. Lê piştî vê mejûyê, pirsgirêkên ji me re hatin, li ser pêkutivîn ku li wan dibin, bûn. Gi-

bikin.
Aboriya belediya we çawa ye?
Belediyen herêmê, gelek caran gi-
liyên xwe tînin ziman ku ji dew-
letê pereyên ku mafê wan in, ni-
karin bistînin.

- Di nav belediyen Tirkîyê de, yê ku rewşa wê herf dijwar e em in. Me ji 1989 an û bi vir ve, ji dewletê yek quruşek nestandiye. Divşbû ku me mehê 100-150 milyon pere bistanda. Lê heta niha, tenê 100 milyon pere ketiye destê me, ew ji di ber deynê me yê çend salan ve dane me. Wezareta Maliyê, ji kijan belediyê re, çiqas bixwaze dikare bi rê bike. Wezareta Bayindiriyê, ji bo projeyan dikare pere veqetîne. Lê ne ew, ne ji banqeya bajaran (iller Bankası) daxwazên me ne anîn cih. Ji ber vê ji, me nikaribû xizmetên normal ji bibira ji gel re.

Baş e, sedem ci ye? Mesela partîvaniyê ye ku, li hember we rex digirin?

- Na mesele ne meseleya parti -
vanyîye. Sedémek bi tenê heye,
ew ji, ji bo ku em Belediya Cizîrê ne
ye.

Tu pêkutiyêن PKK'ê li ser we
çêdibin?

Hûn dibêjîn, em ji bêperetiye
nikarin tu karî bikin. Karêن paqî-
jiyê jî, nameşin. Lê çendê hanê,
İsmet Sezgîn di beyanekê xue de,
digot, "Emê di nêzîk de Rojhilate
Basûr (Günevdoğu) bi temamî pa-

qij bikin.” Beyanêñ bi vî rengî, lser gel çi tesîrê dikin?

- Niha tê gotin ku dê, bi tevgera hundirîn (îç harekat) re cerdên li ser gundên Şimex û Diyarbekirê zêde bûbûn, wê gelek kes bêne girtin. Serokwezîr Süleyman Demîrel ji dibêje: "Emê, vê serhildana 29'an ku PKK'ê dest pê kiriye têk bibin." Rastiya beyanên wiha tune ye. Be yanên wiha, ji çareserkirina pîrsê gelek dûr in. Ma mesele ev e? Kî dibêje ku dê serhildana 30 an çênebe? Divê dewlet dev ji vê siyaseta 70 salan û xelet berde

Berê ji, Özal digot: "Ji bo çare serkina pîrsê, divê Rojhilata başûn bê valakirin. Emê gelê herêmê ji, li metropolan bi cih bikin. Dû re emê werin li van deran xwe li ser berfê bişemîtinin." Hûn wek se rokê belediyekê, li herêmê, vê be vanê cawa dinirxînin?

- Siyasetên sîrgûnkirinê berê ji hatine ajotin. Meseleya Kurdi xelas nebûye. Ëdî gel ji, beyanêni wiha ci dî nagire. Jixwe, ji beyanêni wiha jî kes natîrse. Ëdî gel hînî tevgerên wiha bûye. Ger Serokkomar dixwazene niha jî dikare bê xwe li ser berfê bi semîfîne. Gel rê li her nagire.

Ji Cizîrê koçberiyeke ber bi Ro
java ve heye?

- Ji Şirnexê û hin gündêr dorhêla Cizîrê, ber bi Cizîrê ve koçberiyek heye. Lé ji Cizîrê ber bi Rôjava ve koçberî nîn e. Wekî din, ez koçberkirina gel ji, rast nabînim Em iro li Fethiye, Îzmir û Alanyayê pêkutivênu ku li Kurdan dibin dibî

nin. Koçberî çare nîn e û ne rast e.

We di sempozyûma Mazlum-Der de, ku der mafê pirs-girêka Kurdî de amade kiribûn, a-xaftinek kir û rexne li siyaseta teugerên İslâmî ya der mafê pirs-girêka Kurdî de girtin. We xeletiya ditina musulmanan a ummet-vaniyê berbiçau kir. Hûn wek serokê belediyê ku ji RP'ê hatibû hilbijartîn, siyaseta hêzên İslami, der mafê pirs-girêka Kurdî de çawu dinirxîn?

- Beriya her tiştî, hilbijartina min a ji Refahê ji ber hin rewşen herêmê bû. Ev bi salan bû ku ji 2 malbatên Cizîrê, ku di navbera wande neyartî hebû, serokatiyê distandin. Gel, ji bo ku ev neyartî raweste, ez hilbijartim. Partiya ku ji xwe re dibê İslâmî, îdeolojiya dewletê ya fermî diparêze. Împeryalizma Amerikayê diparêze. Ji her kesî bêhtir, li dewletê xwedî derdikeve. Doza Tirkbûnê dimeşîne. Endamekî vê partiyê, mebûs Hasan Mezarci, ji ber dîtinên xwe yên li dijî kema-

lîzmê ji vê partiyê reaksiyon dibîne. Ger ummetvanî, weke ku rewşenbirêن Tirk ên îslam dikin, li dijî hemû mafşen însanî yên Kurdan derketin be, ger di bin navê din de, li cem mijokdaran cih standin be, ez ne ummetvan im. İro hin ji rewşenbirêن îslamê, rast li meseleyê dinêrin. Me di nav besdarêن civîna Mazlum-Der de dit. Siyaseta pirâniyê û kermancanî kermancanî valerî

Hevpevvîn: Mem Baran